# DÎROK

## AMADEYÎ

## 1

2019/2020

## AMADEKAR

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya dîrokê ve hatiye amadekirin.**

## LÊVEGER

**- Komîteya Şopandinê**

**- Komîteya Fotoşopê**

**- Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK


**BEŞA 1** ........................................................ 7

DÎROK ........................................................ 8
ZANISTÊN GIRÊDAYÎ DÎROKÊ ........................................................ 11
RÊBAZÊN LÊKOLÎN Û DESTGIRTINA ZANISTA DÎROKÊ ............ 15

**BEŞA 2** ........................................................ 21

ÇÊBÛNA GERDÛNÊ ........................................................ 22
CIHÊ JIYANA DESTPÊKÊ ........................................................ 26
DÎROKA CIVAKA XWEZAYÎ ........................................................ 29
PALEOLÎTÎK ........................................................ 32
MEZOLÎTÎK Û NEOLÎTÎK ........................................................ 38
BERHEMÊN ŞOREŞA NEOLÎTÎKÊ LI KURDISTANÊ .................... 43
DÎROKA ÇÊBÛNA HOZ Û ÊLAN ........................................................ 49

**BEŞA 3** ........................................................ 53

ÇAND Û ZIMANÊ ARYENÎ ........................................................ 54
ÇAND Û ZIMANÊ SEMÎTÎKÎ ........................................................ 57

**BEŞA 4** ........................................................ 61

ŞARISTANÎ ........................................................ 62
ŞARISTANIYA SUMERAN ........................................................ 66
EKAD Û BABIL ........................................................ 71
ŞARISTANIYA AŞÛRIYAN ........................................................ 76
ŞARISTANIYA MISIRÊ ........................................................ 79
ŞARISTANIYA ÇÎNÊ ........................................................ 84
ŞARISTANIYA HINDISTANÊ ........................................................ 88
ŞARISTANIYÊN AMERÎKAYÊ ........................................................ 92

**BEŞA 5** ........................................................ 97

HÛRÎ ........................................................ 99
ÎLAM Û GÛTÎ ........................................................ 102
LÛLÛ Û KASÎT ........................................................ 106

MÎTANÎ Û NAYÎRÎ ........................................................................110
URARTU Û HÎTÎT .........................................................................114

**BEŞA 6......................................................................119**

MED ..............................................................................................120
KEYAKSAR Û ASTIYAG ...........................................................123
GIRÎNGIYA MEDAN DI ROJHILATA NAVÎN DE........................127
DEMA MED-PERS...........................................................................131

# BEŞA 1

- Dîrok
- Girêdana zanista dîrokê ya bi zanistên din re.
- Rêbazên lêkolîn û destgirtina zanista dîrokê.

WANE 1

# DÎROK

## Pênaseya dîrokê:

Dîrok, zanistek e ku avabûna gerdûnê û çîroka jiyana mirovahiyê, ji dema borî heta îro, bi me dide nasîn. Ji zanista ku bûyeran bi diyarkirina cih, dem, sedem û encamên çêbûn û avabûna wan lêkolîn dike re, **dîrok** tê gotin.

## Girîngiya fêrbûna zanista dîrokê:

Ji bo naskirina hebûna xwe ya dîrokî, ji bo têgihîştina roja îro û pêşeroja xwe, her wiha ji bo afirandina jiyaneke rast û azad, divê em fêrî dîroka xwe bibin. Mijarên dîrokê, bi hemû aliyên xwe mirovahî ne.

Dîrok, ji bo bi zanebûn û sazûmankirina dema bê, jêdera herî girîng û pêwîst e ku mirov serî lê bide. Di cîhana me ya îro û demên li pêşiya me de, em neçar in bûyeran bi çavên dîrokzanekî, bigrin dest û binirxînin.

Em çi qasî dîroka xwe zanibin, em ê ew qasî civak, netew û cîhanê jî baş nas bikin. Dîroka fermî, her tim berjewendiyên deshiladaran bingeh girtiye û li gorî daxwaza wan hatiye nivîsandin. Civaka ku dîroka xwe nizane, weke mirovê ku bîrgeha xwe winda kiriye. Di heman demê de, piraniya dîroka mirovahiyê ji aliyê dagirker û deshiladaran ve hatiye nivîsandin, ji ber vê yekê, dîrok pir hatiye berovajîkirin û gelek aliyên wê di tariyê de mane. Ji ber vê sedemê jî fêrbûn û fêrkirina dîrokê girîng e. Gelê kurd, yek ji gelên herî kevinar ên ku di dîroka mirovahiyê de, tên nasîn. Çawa ku dîrok ji bo hemû gelan û gerdûnê ristekê dilîze, dîroka Kurdistanê jî ji bo gelê kurd risteke girîng lîstiye.

## Xalên Bingehîn di Ronîkirina Bûyerên Dîrokî de:

### 1. Girîngiya cih û demê:

Bûyerên dîrokî, di dem û cihên diyar de rû dane. Erdnîgarî û mercên xwezayî yên ku civak di nava wan de jiyaye, pir girîng in. Awayê jiyanê û pêşketinên wan, girêdayî rewşa wan a dîrokî ye. Di encama vê yekê de, li cihên cuda, dîrok bi awayên cuda û xweser herikiye. Tiştek bê dem û cih nabe.

Mînak:

Tovên genim di 8.500 B.Z de li gundê Çemê Koteberê hatine vedîtin. Di vê mînakê de, du tiştên girîng hene:

a. Dem: 8.500 B.Z

b. Cih: Gundê Çemê Koteberê

Ev têkiliya cih û demê ya bi hev re diyar dike ku cih û dem bi hev ve girêdayî ne ku ji hev werin veqetandin, tu wateya wan namîne.

### 2. Girîngiya peywendiyên sedem û encaman:

Di pêkhatina her bûyereke dîrokî de, bêguman hin sedem hene. Sedemên bûyerên dîrokî dibin du beş:

a) Bûyeryên xwezayî: Bûyerên ku bêyî xwesteka mirov pêk tên. Mîna: volkan, erdhej, lehî...

b) Bûyerên çêkirî: Bûyerên ku bi destê mirov pêk tên. Mîna: avakirina gundan, şer û pevçûn...

Her bûyereke ku çêdibe, bi erênî yan bi neyînî, encamên cur bi cur bi xwe re tîne.

Mînak:

Ji ber stemkarî û zordariya ku deshiladarên aşûran bi ser gelên herêmê de pêk tanîn, konfederasyonên med, babil û hwd hatin damezirandin. Di encamê de, deshiladariya aşûriyan hat rûxandin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Dîrokê pênase bikin.
2. Girîngiya fêrbûna dîrokê, rave bikin.
3. Cudahiya bûyerên xwezayî ji yên çêkirî, çi ye?
4. Girîngiya cih û demê di dîrokê de, şîrove bikin.

WANE 2

# ZANISTÊN GIRÊDAYÎ DÎROKÊ

Pêşketinên lezgîn ên ku di zanist û teknolojiyê de çêdibin û her ku diçe derbasbûna mirovahiyê ya rewşa "civaka zanistî", pêdiviya ji bo zanînê pirtir dike. Ev rewş jî rê li ber firehbûna qadên lêgerîn û derketina şaxên din ên zanistê vedike.
Her wiha ev rewş nayê wê wateyê ku şaxên zanistê ji hev du cuda bibin. Berovajî vê, di têgihaştina encamê de ji ber ku rêbaz û destkeftiyan bi awayekî hevbeş bi kar tînin, şaxên zanistê di nava hevkariyeke nêzîk de, dixebitin.
Zanista dîrokê, bi hemû zanistan re têkildar e. Bi zanistên mîna: civaknasî, derûniya civakî, dad, aborî, felsefe û bi taybetî têkiliya wê bi zanistên civakî, erdnîgarî, şûnwarnasî û mirovnasî re, gelekî heye.

## 1. Şûnwarnasî (arkolojî):

Zanista şûnwarnasiyê, bi dem û pêvajoyên derbasbûyî re têkildar e. Kevinareyên dîrokî yên sererd, binerd û yên di binê avê de mane, derdixe holê û wan dinirxîne. Bi vî awayî dibe alîkariya bingehîn a zanista dîrokê.
Pisporên arkolojiyê (arkeolog), vekolînan li ser amûr û avahiyên civakên berê dikin. Mebesta wan jê ew e ku çawaniya jiyan û tevgera wan nas bikin.

## 2. Kronolojî:

Zanista demê ye.  Ev zanist, li gorî demê bûyerên dîrokî ji hêla derketina wan, rêz dike. Di herikîna dîrokê de, gelek netewan salnameyên cur bi cur bi kar anîne û bi pêş xistine.

## 3. Civaknasî:

Civaknasî li pênasekirina jiyanê digere û çêbûna civakan û awayê jiyana wan, lêkolîn dike. Ji ber vê yekê, pêwîst e dîrokzan dîrokê bi awayekî civakî bigre dest. Her wiha pêwîst e dîroka civakê bê nivîvsandin. Ji ber vê yekê, dîrok û civaknasî ji hev û du nayên qutkirin.

## 4. Mirovnasî (antropolojî):

Mirovnasî, di cîhanê de bi navê antropolojî tê nasîn. Zanista ku aliyê fîzîkî, guherîn û koka mirovan, teoriyên pêşketina mirovan, rengên wan û cureyên mirovan, destpêkê lêkolîn dike.

## 5. Erdnîgarî:

Beşeke ji zanistê ye ku ji bo destnîşankirina bûyerên dîrokî, dibe alîkar. Ev beşa zanistê di cîhanê de, cihên weke: parzemîn, herêm, bajar, okyanûs, derya, deşt û çiyayan, lêkolîn dike. Tevahî bûyerên dîrokî, di cihekî erdnîgariyî de çêbûne. Ji beşa ku dîrok û erdnîgariyê bi hev ve digire dest re, "**erdnîgariya dîrokî"** tê gotin.

## 6.Felsefe:

Di navbera felsefe û zanista dîrokê de, têkiliyek heye. Ji ber ku felsefe weke zanist, qewimîna bûyerên dîrokî bi awayên xweş, rave dike. Felsefe, li ser hebûn û avabûna gerdûnê radiweste; dipirse"ka ev gerdûn çawa çêbûye?" û lêkolîn dike.

## 7. Dirav:

Dirav di lêkolînkirina dîrokê de, yek ji zanistên her girîng e. Ji ber ku wêneyên xwedawend, qiral, mîr û navên wan li ser van diravan hatine neqişandin û carcaran jî salên ku ev dirav têde çêkirine li ser diyar in.

## 8. Aborî:

Xebatên hilberîn, parvekirin û mezaxtinê yên ku ji bo berdewamkirina pêdiviyên mirov û civakan hatine kirin, ji aliyê vê beşa zanistê ve, tê lêkolînkirin.

Di bingeha her bûyera dîrokî de, sedemên aboriyî cih digirin. Bi alîkariya aboriyê, sedemên bûyeran derdikevin holê û ronî dibin. Aborî, bandora xwe li hin saziyên civakî yên mîna: ramyarî, bîrdozî, rewşa demografya civakê û teknolojyayê dike.

## 9. Huner:

Dema ku dîrokzan zanînên wî li ser cureyên hunerê hebin, ev zanîn, ji bo têgihaştina serdema ku lêkolîn dike, jê re dibin alîkar. Her wiha dema ku cureyên hunerê lêkolîn dike, gelek cihên ku mirov lê dijiyan, nas dike. Her wih di gelek razên

jiyana mirovên wê demê de, tê digihêje. Mînak: kevineşopî, sinc û hwd.

## 10. Zimannasî (Fîlolojî):

Zimannasî, zanista ziman e. Zimanên ku li ser rûyê erdê pê hatine axaftin ên ku hîn bi wan tên axaftin û dîroka zimanan jî lêkolîn dike. Qada lêkolîna vê zanistê di du beşan de, hatiye komkirin.

### a) Zimanên jîndar:

Ji zimanên ku koka xwe dispêrin demên bûrî, hebûna xwe didomînin û îro jî bi wan tê axaftin re, **zimanên jîndar** tê gotin.

### b) Zimanên mirî:

Ji zimanên civakên ku di demên bûrî de jiyane, lê nekarîbûn hebûna xwe bidomînin re, **zimanên mirî** tê gotin. Mîna: sumerî, ekadî, babilî, hîtîtî...

Civakên ku di dîrokê de jiyane, bi zanista ziman tên diyarkirin. Bi vî awayî, ka ew civak girêdayî kîjan nijadê ye, derdikeve holê.

## 11. Paleografya:

Bi ABC û nivîsên kevin ên ku di dîrokên kevin de, hatine bikaranîn re têkildar e û xwendina wan derdixe holê. Bi vî awayî, ji ronîkirina bûyerên dîrokî re dibe alîkar.

## 12. Nijadnasî (Etnografya):

Bi jiyana çanda neteweyan re, têkildar e. Çand, ziman û baweriyên her civakekê (bi taybetiyên wê ve) lêkolîn dike. Armanca wê ew e ku di dîroka mirovahiyê de ji nû ve, guhartinên çandî lêkolîn bike.

## 13. Dîplomasî:

Peymanên ku di navbera qiralan de hatine muhirkirin, weke belgeyên alîkar (dem, cih) bi zanista dîrokê re, tên pejirandin. Di nava dîrokê de, karê dîplomasiyê gelekî girîng e.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çi girêdan di navbera dîrok û zanista mirovnasiyê de, heye?

2. Çi cudahî di navbera zimanên jîndar û yên mirî de, heye?

3. Divê dîrok bi awayekî civakî bê nivîsandin, rave bike.

4. Diplomasî bi dîrokê re dibe alîkar, rave bike.

WANE 3

# RÊBAZÊN LÊKOLÎN Û DESTGIRTINA ZANISTA DÎROKÊ

Erkên herî bingehîn ên zanista dîrokê, bêyî ku pêşketinên civakî ji hev qut bike, wan di nava têkiliyan de, digire dest. Her serdemekê çi ji ya berê girtiye û çi daye dema me ya niha, bi tevahî zindîbûna xwe didomîne. Di vê wateyê de "têgihaştina dîroka zanistê, hîna di qonaxa destpêkê de ye". Nirxandina dîrok û civakê ya bi deskeftiyên ku di dest de hene, zanyarên civakî bi berpirsyariyên mezin re, rû bi rû hiştine.

Şîroveya dîroka heyî, ji heyînên mîna: ol, xanedan, qiral, şer, netew.... pêk hatiye. Nêrîna li ser dîrokê ya bi vî şêweyî, li şûna pêşketina civakê, hizirandin û têgihaştina wê bi xwe jî asteng kiriye. Dîrok, ne li ser bingehên olî, netewî û xanedanî, tê nirxandin. Dema ku bi wan bê nirxandin, nabe dîroka civakê. Ji bo ku bersiva ji rêderxistina nivîsandina dîrokê were dayîn, neçariya ji nû ve destgirtina dîrokê derdikeve holê. Nivîsandina dîroka jinê, li cihê ku mafê wê heye û lê be, berovajî vê yekê, ew pir bi şûn de hiştine. Di pêvajoya şaristaniyê de her ku desthilatdariya mêr bi hêz bûye, jin li derveyî civakê hatiye hiştin. Ev jî bû destpêka nivîsandina pirtûkên "dîroka bêjin". Ji rêderketin û berovajîkirinên mezin ên ku encama newekheviya zayendan in, weke dîrok hat pêşkêşkirin.

Yek ji mercên pêşîn ên desthilatdariya ramyarî, ew e ku karibe têgeha "ez navend im" bisepîne. Her wiha ferzkirina têgeha kirde (sobje) û tengkirina qada civakê ji boyî ku hêza bireser (obje) asteng bike.

Bi vî rengî pesindayîna dîroka fermî, nabe dîrok. Ne rast e ku mirov ji dîroka deshiladaran re, bibêje dîrok. Ya rast ew e ku mirov dîrokê di wateya civakî de bişopîne û di cewherê dîroka gerdûnî de bibîne. Dîroka gerdûnê di rastiya xwe de, pêşketinên

civakî ne. Dema ku rêbaza dîrokê bi ser bikeve, hêzeke çareyê ya weke wê derdikeve holê.

## Ji ber vê yekê dema ku dîroknas lêkolîn bike, pêwîst e van xalan li ber çavan derbas bike:

1. Pêwîst e bandorên xwezayî, civakî û derûnî yên ku bandorê li bûyeran dikin, baş nas bike.
2. Belgeyên kevin û nû ji hev cuda bike û yên kêm mane jî sergihayî bike.
3. Pêwîst e bê alî nêzîkî bûyerê bibe.
4. Divê hêza wî ya ravekirina bûyeran hebe û karibe xwe bigihîne encamên zanistî.
5. Divê zincîreke dîrokî di nava bûyeran de çêke bêyî ku ji hev qut bike û dîrokê bi hev ve girê bide.
6. Ji bo ku dîrok rast bê nivîsîn, pêwîst e zimanê efsaneyan rast tê bighêje.
7. Berhema ku derxe holê, divê rûpeleke nû bike sermiyanê dîrokê.

## Şêwazê desgirtina zanista dîrokê:

### 1.Peydakirina belgeyan:

Dîroknas, li gorî qada pisporiyê, dema ku bûyereke dîrokî lêkolînê dike, pêwîstî bi tevahî jêderên girêdayî mijara ku lê dikole heye û wan li gel hev kom bike. Ev jêder, bi piranî belavî du beşên bingehîn dibin:

### a. Jêderên pileya yekem:

Tevahî kavil û avahiyên ku ji demên derbasbûyî mane, tevahî kel û pelên nirxê wan ê şûnwarî hebe yan jî tune be, alav, çek, nivîsên kevin, salname û tevahî belgeyên nivîskî (nivîsên arşîvan, tapo û lênûskên tomarkirinê), dirav, madalyon û muhir, jêderên dîrokî yên pileya yekem in.

### b. Jêderên pileya duyem:

Nivîsên dîrokî yên ku di demên borî de hatine nivîsîn; ango **pirtûkên dîrokî** ne. Dema pêwîst be ji deskeftiyên felsefî, wêjeyî, dadî û erdnîgarîiyî jî sûd tê girtin. Wekî din jî helbestên kevinar, çîrok, efsane û destaneyên koka wan diyar an jî nediyar, (bi devokî heta niha hatine û nehatine jibîrkirin) sûd ji wan tê girtin. Ji van re jî "jêderên devokî" tê gotin. Pirtûkên dîrokî yên destpêkê, ji sedsala 5'an B.Z û pê de, hatine nivîsîn.

## 2. Dahûrandin, rexnekirin û encam:

Di vê qonaxê de, di navbera jêderên cur bi cur ên hatine komkirin de, bi armanca pêkanîna sentezeke nû, zanist ji hev tên cudakirin, rexne bi pêş dikevin û çare tê pêşinyarkirin.

### Mînak:

Dîtina perestgehea Xerabreşkê li Rihayê.
Dahûrandin: Naskirina dema wê bi rêya zanyarên arkeolojîkê.
Rexnekirin: Ev perestgeh ji bo çi ye û sedema çêkirina wê çi ye?
Encam: Ji ber ku navenda sereke ya hozên herêmê bû.

# Cureyên Dîrokê

## 1. Dîroka çîrokî (mîtolojî):

Vegotinên dîrokî yên bi awayê efsaneyî ne. Dema ku tê gotin dibe ku tiştên ji derveyî hêza mirov û nepêkan tê de hebin, lê ew bixwe di bingehê xwe de, rastiyên civakî vedibêjin. Dibe ku ev rêbaz beriya dîroka nivîskî hebe, lê di dema sumeran de, nêzî salên (3.500 B.Z) bi awayekî nivîskî li ser tabloyan hatiye nivsîn.

## 2. Dîroka Kronolojîk:

Ev curenivîsa dîrokî ne. Mîna: Salnameyên qiralan ên kevin li Rojhilata Navîn. Di vê cureyê de, bûyerên her salekê, bêyî ku di navbera wan de, peywendiyek bê sazkirin li pey hev hatine rêzkirin.

## 3. Dîroka Lêkolîneriyê:

Bingehê zayîna dîroknasiya nûjen pêk aniye. Ji sedsala 19'an û pê de, weke zanistekê hatiye pejirandin. Dîrok jî weke şaxekî zanistê, bi rêbaz û zagonên lêgerîn û pêşxistinê ve, hatiye girêdan.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Bi çi şêwazî mirov zanista dîrokê digire dest? Şîrove bike.

2. Dema ku dîronas mijareke dîrokî lêkolîn bike, divê çi di ber çavan re derbas bike?

3. Çi cudahî di navbera jêderên pileya yekem û jêderên pileya duyem de heye?

4. Li gorî awayê nivîsînê, çend cureyên dîrokê hatine nivîsîn?

# BEŞA 2

- Çêbûna gerdûnê
- Cihê jiyana destpêkê
- Dîroka civaka xwezayî
- Serdemên kevirî
- Mezolîtîk û Neolîtîk
- Berhemên Şoreşa Neolîtîkê li Kurdistanê
- Dîroka çêbûna hoz û êlan

WANE 1

# ÇÊBÛNA GERDÛNÊ

## 1. Dîroka Gerdûnê:

Di çêbûn û temenê gerdûnê de, teoriyên cur bi cur hene. Ji van teoriyan a herî zêde tê pejirandin, teoriya teqîna mezin **Bîg Bang** e. Her wiha, temenê gerdûnê yê ku ji aliyê giştî ve, li gorî teoriya teqîna mezin hatiye pejirandin, nêzî 14 milyar sal e.

Ji beriya gerdûnê; ne cih ne jî dem hebû. Tenê valahiyeke pir mezin hebû. Di vê valahiyê de, heybereke ku ji serê derziyê



biçûktir e hebû. Zanyar, guman dikin ku ev heyber mîna gogeke gazê bû. Ev gog, xwedî pileyeke germahî û dewisîneke pir bilind bû. Ev xala biçûk, di heman demê de, bi lezeke bêdawî di nava xwe de, dilive. Tê texmînkirin ku di encama tengavbûna ku ev liv û tevger di nava xwe de pêk aniye. Ev heybera biçûk teqiyaye. Li gel teqînê, ev heybera dagirtî bi lezeke mezin li hemû valahiyê belav dibe. Piştî vê teqînê nêzî 300 hezar salî, atom û şewqa destpêkê çêdibin. Piştî nêzî 500.000 salî, stêrkên destpêkê çêdibin; piştî milyarek sal galaksiyên destpêkê çêdibin. Piştî 5 milyar salî, gerdûn dikeve nava birêkûpêkiyê.

Lê gerdûnê, hîn jî xwe sergihayî nekiriye; gerdûn, her tim di nava tevger û guherînê de ye. Di zanista îro de ji ber ku gerdûn

her tim di nava tevger û guhertinan de ye, weke zindiya herî berfireh hatiye pejirandin.

## 2. Çêbûna Cîhanê û Zindiyan:

Tê texmînkirin ku cîhan nêzî 5-6 milyar sal beriya niha çêbûye. Di destpêkê de, weke gokeke agir e. Di nava vê goka agir de, parçeyên giran hêdî hêdî tên xwarê û parçeyên sivik û gaz jî ber bi jor ve diçin. Ango bi bilindbûna van parçeyên sivik û gazê, qata hewayê çêdibe. Cîhan, hêdî hêdî diqerise û dirûva xwe digire. Germahiya bilind, di heman demê de, hîdrojen û oksîjenê jî derdixe holê.
Dema ku du atomên hîdrojen û atomeke oksîjenê digihêjin hev, hêlma avê çêdibe. Ev hêlm, bi demê re diqerise û weke baranê dibare. Lê ji ber ku rûyê cîhanê pir germ e, ev baran beriya ku bigihêje erdê, dîsa dibe hêlm û ber bi asiman ve, diçe û demeke dirêj wiha didome. Ser rûyê erdê diqerise û baran hêdî hêdî digihêje erdê. Oksîjena zêde ya ku ji avê vediqete, bilind dibe û qata ozonê çêdike. Ozon jî, oksîjena giran e; ango ji sê atomên oksîjenê çêdibe.
Qata ozonê, cîhanê ji tîrêjên ziyandar diparêz e. Ev parastin dibe sedem ku ji zindiyan re, mercên jiyanê yên guncav çêbin. Avhewa piştre çêdibe. Gazên weke: azot, karbondîoksîd, oksîjen û hîdrojen di avhewayê de dest bi kombûnê dikin.
Her ku germahî kêm dibe, baran digihêje ser rûyê erdê û bi vî awayî, cîhan; tijî gol, derya, çem û hwd, dibe. Êdî di cîhanê de, rewşa jiyanê çêdibe. Yekemîn mercên jiyanê di binê deryayan de çêdibe. Beriya 3.5 milyar sal, zindiyê yekem yê bi navê amîp çêdibe. Ev zindî, yekşaneyî ye. Di vê demê de ,bêhindana bioksîjen tune ye, bêhindana bêoksîjen heye. Ev jî demeke dirêj didome.
Ji ber vê sedemê jî di binê deryayan de, yekemîn zindî çêdibe û li vê derê cureyên zindiyan zêde dibin. Piştre, ji yek şaneyê derbasbûna zindiyên pir şaneyî çêdibe. Derbasbûna zindiyên pir şane, nêzî milyarek sal didome. Nêzî 500 milyon sal, yekemîn zindî ji deryayê derdikeve; hem li deryayê hem jî li bejahiyê

dest bi jiyanê dike. Cara yekem, beq derdikevin bejahiyê. Piştre, lawirên xişinde çêdibin. Di navbera 400 û 350 milyon salî de ,cureyên masiyan çêdibin. Piştre, kêzik û lawirên bibask çêdibin.

Di navbera 225-65 milyon sal de, lawirên mîna: gumgumok, dînosor û sûsmar (timsah) çêdibin. Di dawiya 65 milyon salî de, ji ber ku ji nişka ve di avhewayê de guherîn çêbûn, gelek lawir û şînatî tune bûn. Di vê demê de, dînosor jî tune dibin. Ev dibe sedem ku di wê demê de, hejmara lawirên guhandar pir bibe. Ew jî ev in: prîmat, meymûn, parçemok û delfîn; 33 cureyên guhandaran hene. Ya herî nêzî mirov, prîmata bi navê "promîsiyen" a ku li ser darê dijî. Bi demê re, ew ji darê dadikeve û pêşketina mirovan pêk tîne. Temenê mirov 7 milyon sal tê pejirandin. Ev tê wateya ku heta mirov gihaştiye rewşa niha, bi milyonê salan derbas bûye.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çêbûna gerdûnê, şîrove bike.

2. Bi çi awayî zindî derketine holê?

3. Piştî ku serdema Qeşayê bi dawî bûye, çend cureyên lawirên guhandar derketine holê?

WANE 2

# CIHÊ JIYANA DESTPÊKÊ

Cihê ku mirov cara yekem lê jiyaye, rojhilatê Efrîkayê ye. Ev cih, di navbera Kenya, Tanzanya û Etiyopyayê de ye. Piramîtên destpêkê ji vê derê, belavî hemû cîhanê bûne. Di vê pêşketinê de, çawaniya vê erdnîgariyê û bandorên ku li jiyanê kirine risteke diyarker lîstiye. Li gorî vedîtinên zanista erdnasiyê (jeolojiyê) beriya 8-10 milyon sal, li rojhilatê Efrîkayê qelaştin çêdibe. Di encama vê de, çalên mezin çêdibin. Ev jî dibe sedem ku çem û gol çêbibin. Golên Victoriya, Koga, Rûdolf û Çemên Omo û Havasê di vê demê de, çêdibin.

Di encama vê cudabûnê de, ber bi aliyê bakurê rojhilat û başûrê rojava ve, rêzeke herî dirêj a qelişandinê çêdibe. Ev jî bandorê li cureyên şînatî û lawiran, dike. Di vê demê de cudahiya di navbera mirov û prîmatan de, xelekek heye. Qebareya mejiyê wan, weke 400-500 $cm^3$ tê dîtin. Her ku diçe, li ser du lingên xwe disekinin û xwarina xwe peyda dikin.

## 1. HOMO HABILIS (mirovê/a kêrhatî):

Qebareya mejiyê Homo Habilis, 650 $cm^3$ e. Kevirekî li kevir dixe û bi wan keviran, tiştên ku jê dike, an jî hûr dike, bi dest dixe. Nêzîkî 10 amûrên kevirî çêdike. Lê hîn jî nikare li ser lingên xwe bisekine; fîzîka wî, di navbera mirov û prîmatê de ye. Beriya 2-3 milyon sal, destpêka belavbûnê ji bakurê Efrîkayê, herêma Kobiforayê ya li Geliyê Rîfê, ber bi Deryaya Sor û Deryaya Spî ve tên. Fosîlên Homo Habilis, tenê li rojhilatê Efrîqayê di navbera Kenya, Tanzanya û Etiyopyayê de, hatine dîtin.

## 2. HOMO ERECTUS (MIROVÊ/A ŞIPYA):

Nêzî 1,5-2 milyon sal beriya niha, bi Homo Habilis re pêşketin çêbûye. Êdî ew dikare li ser her du lingên xwe raweste. Qebareya mejiyên wan 900 $cm^3$. Nêzî 60 amûran bi kar tîne. Nêzî 500 hezar sal beriya niha, agir xistiye bin kontrola xwe û bi kar aniye.

Beriya 1-1,5 milyon sal, meşa ber bi Hilala Zêrîn ve, dest pê kiriye. Di dema Homo Erectûs de, hem koçî herêmên din ên Efrîkayê, hem jî koçî parzemînên din jî kirine. Ev belavbûn, bi aliyê rojhilatê Deryaya Spî, ber bi Toros û Zagrosê ve, hatiye kirin.

## 3.HOMO SAPIENS (MIROVÊ/A ZANA Û HIŞMEND):

Di herikîna pêşketinê de, ji Homo Erectûs, derbasbûna Homo Sapiens nêzî du sed hezar sal, pêk hatiye. Qebareya mejiyê wî 1400 $cm^3$ e. Homo Sapiens, dibin du beş:

### 1) Homo Sapiens Neandertal:

Fosîlên yekem ên Homo Sapiens Neandertal, li Newala Nînderê ku li Elmanyayê ye, hatine dîtin. Navê Neandertal jî ji vir digire. Beriya 20 hezar salî ji holê rabûne. Hin fosîlên wan, li Şkefta Şanîdarê ya ku li başûrê Kurdistanê ye, hatine dîtin. Heta niha sedema jiholêrabûna wan tam nayê zanîn.

### 2) Homo Sapiens Sapiens (mirovê zana û hişmend):

Homo Spiens Spiens jî êdî ji aliyên biyolojîk ve, weke mirovên niha ne. Di dema Homo Erectûs de, belavbûn sînordar e, lê Homo Spiens li her derên cîhanê belav dibe. Berî bîst hezar sal, mirov di Tengava Berîngê re, derbasî bakurê Amerîkayê bûne. Piştre ber bi başûr ve û ji Asyayê ber bi Awûstralyayê ve belav bûne.

Pêşketina mirov nêzî 7 Mîlyon sal, temam bûye. 100 hezar salên dawî, biyolojiya mirov weke mirovên niha tê pejirandin. Sedemên vê jî civakbûn bi pêş dikeve, zîrekbûna dahûranî pir tê bikaranîn û bi vî awayî bikaranîna fîzîkî kêm dibe. Dema ku bikaranîna fîzîkî kêm dibe, di biyolojiya mirov de, pêşketin çênabe; an jî gelek giran çêdibe. Mirov niha ji aliyê biyolojiyê ve, guhartineke rasteqîne najî. Lê belê ji aliyên çandî ve, guhartin û veguhartineke mezin, dijî. Mirov di wateya xwe ya îro de, ji bo bibe mirov, hem ji aliyê biyolojêyê hem jî ji aliyê çandê ve, gelek zehmetiyên mezin, jiyaye.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çima rojhilatê Efrîqayê, cihê despêka jiyana mirovahiyê ye?

2. Cudabûna di nava Homo Habilis, Homo Erectus û Homo Sapiens de, rave bike.

3. Di dema kîjan mirovî de belavbûna mezin (belavbûna mirovli her deverên cîhanê) çêbûye û çima?

WANE 3

# DÎROKA CIVAKA XWEZAYÎ

## Civaka Xwezayî:

Pergala civak û civakbûnê ya ku ji dema veqetîna mirov ji prîmatan ve, dest pê dike û heta civaka hiyararşîk didome. Ji dema avabûna gerdûnê heta niha, ji bo hemû zindiyan pêvajoyeke girîng û dewlemend, hatiye derbaskirin. Zindî hemû hebûna xwe di nava hevsengî û hevpariyê de, domandine.

Her ku dem derbas bûye, dewlemendiyên cur bi cur bi dest



xistine. Pêşketin bi zindiyan re çêbû û ji zindiyên yekşaneyî derbasî zindiyên pirşaneyî bûye. Ji yek rengî, bi milyonên rengan ava bûye. Her heyberê, xweseriyeke xwe, ava kiriye. Bihevrebûna hemû zindiyan, avakirina wan a dewlemendiyan û pêşketina wan, bûye dîroka gerdûnî û heta niha didome. Di gerdûnê de, her tişt, li gorî xweseriya xwe, zindî ye.

Beriya niha bi milyonên salan, zindiyan bi liv û lebatên xwe, hebûna xwe, domandine. Mirovan li hemberî zoriyên serdeman, xweseriya xwe parastine û jiyana xwe domandine. Li himberî van zoriyan, fêrî çanda xweparastin, xwetêrkirin û xwezêdekirinê bûne.

Teşeya jiyanê ya bingehîn bi klanên ku ji 20-50 kesî pêk tên, dest pê dike û bi jiyana gundîtiyê dighêje asta herî jor.

Di lêkolînkirina dîrokê de, dîroknasan rêbazên cur bi cur bi pêş xistine. Her dîroknasekî, li gorî nerîna xwe, dîrok pênase kiriye. Hin dîroknasan li gorî amûr û berhemên ku civakê çêdikirin, dîrok dabeş kirine. Li gorî vê jî nav li serdemên dîrokê kirine. Ev navlêkirin, wateya jiyana wê serdemê ji her aliyan ve, zelal nake, lê ji bo hêsaniya têgihaştina wê serdemê, nav lê kirine. Li gorî vê, civaka xwezayî li ser sê serdeman hatiye dabeşkirin:

1. Serdema Paleolîtîk (Serdema Kevirî ya Kevin )
2. Serdema Mezolîtîk (Serdema Kevirî ya Navîn)
3. Serdema Neolîtîk (Serdema Kevirî ya Nû)

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çima dîroknasan navê serdemên kevirî li civaka xwezayî kirine?

2. Mirovan, bi çi awayî di civaka xwezayî de, jiyane?

3. Civaka xwezayî, di çend serdeman re, derbas bûye? Diyar bike.

WANE 4

# PALEOLÎTÎK

## **PALEOLÎTÎK** (Serdema Kevirî ya Kevin 7.000.000 - 20.000 B.Z):

Mirovahiyê, dema herî dirêj di serdema bi navê Serdema Paleolîtîkê jiyaye. Hatiye diyarkirin ku mirovahiyê li rojhilatê Efrîkayê, dest bi jiyanê kiriye. Piştî wê, gav bi gav li hemû cîhanê belav bûye. Ji destpêkê heta îro, mirovahiyê bi qasî 7 milyon sal derbas kiriye. Di vê demê de, di sarbûn û germbûna avhewayê, qeşagirtin û helandinê de, guherîn û pêşketin pêk hatine. Mirovahiyê, di nava vê dema dirêj de, wek prîmatan, jiyaye. Piştî wê, hêdî hêdî gavên civakbûnê avêtine.

## Çima Mirov Dibe Civak?

Mirov, bi pêkhatina xwe heyîneke ji zindiyên din lawaztir e. Ji bo ku zarokek xwe biparêze, pêwîst e ku di demeke dirêj re, derbas bibe. Her wiha, nikare bi tena serê xwe li himberî metirsiyên xwezayî bi ser bikeve. Mirov di xwezayê de, zindiyê herî lawaz bû û rêya derbaskirina lawaziya xwe di civakbûnê de, dîtiye. Ger civakbûn nebe, mirov nikare hebûna xwe berdewam bike. Di vê wateyê de, civakbûn hebûna cureya mirov e.

## Klan:

Bi vî awayî, teşeya civakbûnê ya destpêkê klan e, ya ku ji 20-50 kesî pêk dihat. Di hundirê klanê de, serwerî, çînîtî, hiyararşî, mêtinkarî û kedxwarî tune bûn. Têkiliyên endamên klanê li ser bingehê hevparî û karbeşiyê bi pêş diketin, ne li ser bingehê serwerî û deshiladariyê bû. Di klanê de, bi awayekî xwezayî û wekhev bi hev re dijiyan. Her kes li gorî karîna xwe, xwedîrol bû û hev temam dikirin. Hemûyan bi hev re, wate didan jiyanê. Endamên klanê, li derveyî klana xwe, nikarîbûn bijîn. Rêgezên klanan ew bûn ku her kes ji bo yekî û yek ji bo her kesî bû.

Negengaz e ku endamên klanan ji hev bên veqetandin.  Ji bo wê jî jiyana wan jiyaneke komînal û demokratîk bû. Jiyana klanê, li derdora jinê bi pêş dikeve. Ji ber ku jin zarokan tîne, wan mezin dike, şînatiyan diçîne, lawiran kedî dike, hilberînê dike, kom dike, nifşên klanê berdewam dike, têrkirin û parastina klanê pêk tîne, pîroz tê dîtin. Di nava klanê de, rola jinê diyarker e. Her çi qas mêr ji aliyê fîzîkî ve bihêz be jî lê tu roleke wî ya diyarker tuneye.



Alavên kevirî yên serdema Paleolîtîkê

## Mirovên destpêkê, debara xwe bi çi dikirin?

Li gorî nerînên hevbeş, wan nêçîra lawirên kovî û balindeyan dikirin. Masî û marmarok digirtin. Fêkî û hêk kom dikirin û ji binê erdê kokên şînatiyan derdixistin. Her wiha, cil û bergên xwe ji kevlên lawiran çêdikirin. Hinan di şkeftan de, jiyana xwe derbas dikirin û hinan ji çiqlên daran ji xwe re, stargeh çêdikirin. Ji bo ku di nêçîrvaniyê de serkeftî bin, pêwîst bû ku nêçîra xwe, demeke pir dirêj bişopandana.
Di encamê de, zanîna civakî ya ku jê re "teoriya nêçîrvaniyê" tê gotin, pêk hat. Ji hev cudakirina şînatiyên tîmarker û bijehr jî,

bi serboriyan hatibûn têgihîştin û beşdarî teoriya civakî bibûn. Pêwîst bû ku demên nêçîra lawiran û komkirina hêkan jî bihata zanîn. Ji bo serkeftina di vî karî de, fêrbûna tevgerên gewdeyên asîmanî neçarî bû. Pêwîst bû mirovan demên derketin û windabûna heyv û stêrkan û bandora wan a li ser lawir û şînatiyan jî zanîbana.
Her wiha diviyabû ku di çêkirina amûran de, kevirên herî destdayî, kîjan in û li ku derê tên peydakirin nas kiribana. Ji bo mirovên destpêkê, zanînên derbarê stêrnasiyê de, zanista şînatî û erdê û ya lawiran ji bo jiyanê pir girîng bûn.

## Vedîtina Agir:

Mirov ji bo jiyana xwe, agir bi kar aniye. Mirovên destpêkê bilihevxistina du keviran an jî bi firkandina du qetên daran, agir bi dest xistine. Bikaranîna agir û amûran, pêşketineke mezin di ramanên mirovan de, çêkiriye.

## Ziman:

Dema ku mirov derketine ser rûyê erdê û jiyane, ziman tune bû. Zimanê hêmayî (zimanê deng û tevgera laş) dihat bikaranîn. Têgihaştina wan ji hev re di rêya hêma û nîşaneyan bû. Bi demê re, pêşketin çêbû qîj û deng derxistin. Ev jî ji ber ku mirov her ku diçe li ser her du lingên xwe radiweste, pişta wî rast dibe û deng bi wan re, derdikevin. Bandora xwezayê jî li jiyana wan hebû. Ji ber ku mirovên destpêkê, li lawiran temaşe dikirin û dengê tiştên di xwezayê de, yên weke: xuşexuşa avê, fîzfîza ba, gumeguma tavan nas dikirin û bi vî awayî, nav li tiştan kirin û ziman bi pêş ket.

## Bawerî:

### 1. Anîmîzm:

Baweriya mirovên destpêkê, anîmîzm bû. Anîmîzm giyanperestî ye. Her tiştî weke xwe dibîne. Cudabûna kirde û bireser tune ye. Mirov her tiştî zindî dibîne. Ji ber ku mirovê destpêkê, ji xwezayê qut nebibû, hişê hestyarî ji yê dahûranî, li gel wî zêdetir bû û di nava hevgirtinekê de bû. Ramana anîmîzmê ji vir derdikeve. Bi domana demê re, hişê dahûranî li gel mirov bi pêş dikeve, ev pêşketin bi xwe re, serpêhatiyan

çêdike. Serpêhatî û zindîdîtina xwezayê bi xwe re, zanisteke nû bi pêş dixîne. Ev zanist xwe weke efsaneyê (sihrekê) bi nav dike. Mirov dikare, efsaneyê weke destpêka zanistê bibîne. Bûyerên xwezayî weke erdhej, volkan û ba li himberî jiyana xwe, weke metirsiyê dibînin û dihizirin ku dê çawa wan bixin bin kontrola xwe. efsane li vê derê dest pê dike. Herî zêde jin û mirovên kal her roj tiştên nû vedibînin. Ev bi demê re, rê li ber komkirina agahiyan vedike. Bi naskirina şînatiyan re, dermanan çêdikin. Bingeha bijîşkiyê di vê demê de, hatiye danîn. Dema ku ev giya nexweşan baş dikin, vê bi efsaneyê ve girê didin. Efsane wê demê weke diyardeyeke bijîşkî, tê destgirtin.

Mirov her bûyer û diyardeyên li gerdûnê dişopîne û bi nav dike. Çanda razberî û şênberî jî bi civakbûnê teşe digre. Di wê demê de, mirov gelek tişt kirine, lê em hîn jî bi temamî nizanin. Dibe ku em encax  ji %1 ê bizanibin.

### 2. Totemîzm:

Mirov êdî dest bi naskirina xwezayê dike; bûyerên ku dê zirarê bide wan, lawirên zirardar û lawirên bisûd nas dike û wan ji hev cuda dike. Piştre di her klanê de, lawirek an jî tiştekî din di xwezayê de pîroz tê dîtin û çanda pîrozdîtinê bi pêş dikeve. Ev dihêle ew tişt bibe nasnameya klanê. Ji vê re jî totem tê gotin.

Totem, di nava klanê de, girêdan û civakbûnekê bi xwe re tîne. Sembola her klanekê çêdibe. Totem dibe sedema civakbûn û jiyana wan. Klan di hebûna totemê de, yekîtî, rêzgirtin û hezkirinê dibîne. Bo nimûne, ji bo ku klan bi şîr û goştê çêlekan xwe têr dike, wê pîroz dibîne û ji çêlekê re, peristin derdikeve holê. Çi qasî ji totemê re rêzgirtin bi pêş dikeve, ew qasî ji xwe re jî rêzgirtinê digire. Totem, morala klanê ye ango her tiştê klanê ye. Mirovahiyê ji %98 jiyana xwe bi awayê klanî buhirandiye. Teşeya klanê teşeya civakê ya herî dem direj e.

## Şkefta Şanîdarê:

Li başûrê Kurdistanê, di navbera bajarê Rewandoz û Diyanayê de, li kêleka ava Zapa Mezin cih digire. Ji Serdema Paleolîtîkê heta Neolîtîkê ji bo klan û civakê bûye cihê xweparastin û cîwarbûnê.  Li gorî lêkolînan, bermahiyên Şanîdarê, digihêjin

65 hezar sal B.Z. Mirovê Şanîdarê, weke mirovê Neandertal tê



Şkefta Şanîdarê

binavkirin. Nêçîrvanekî jêhatî bû, cil û bergên ji kevelên lawiran, li xwe dikirin. Amûr û çekên xwe, ji hestî û berên tûj çêdikirin.

Li gorî lêkolînên ku li şkeftê hatine kirin, hestiyê deh mirovan hatine dîtin. Sê ji wan vedigerin 45.000 sal û yên din vedigerin 60.000 salî. Ev yek ji mirov re, diyar dike ku di vê şkeftê de, bi qasî 15.000 salî jiyanê berdewam kiriye. Her wiha, Fosîlên mirovan ên ku di şkeftê de hatine dîtin, diyar dikin ku jiyana wê demê jiyaneke hevbeş bû; ji ber ku mirovekî pûç tê de hatiye dîtin. Ev jî nîşaneya xwedîlihevderketin û nirxên civakî ye. Her wiha, hin mirovên ku li vê şkeftê mirin e û hatine veşartin, bi heşt cureyên gulan, hatine xemilandin. Ev yek jî nîşana hizir û baweriya mirov diyar dike. Sedema mirina hinek niştecihên wê şkeftê vedigere ketina kevirên şkeftê bi ser serê wan de ye

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çima civakîbûn sedema hebûna mirov e?
2. Jiyana klanê, rave bike.
3. Bi çi awayî, teoriya nîçîrvaniyê pêk hat?
4. Çima efsane weke despêka zanistê tê dîtin?
5. Çawa Totemîzm di jiyana klanê de, derdikeve?
6. Berhemên Şanîdarê, çi nîşanî mirov dide?

WANE 5

# MEZOLÎTÎK Û NEOLÎTÎK

## **MEZOLÎTÎK** (serdema keviriî ya navîn 20.000 - 12.000 sal B.Z):

Di navbera 20-12 hezar sal B.Z de, weke serdema Mezolîtîkê, tê naskirin. Ji vê serdemê re, serdema qeşayê ya dawî tê gotin. Di vê demê de, li Mezopotamyayê, demsal ji bo jiyanê guncaw in.

Ev dem, demeke navber e ku derbasbûna pêvajoya Neolîtîkê pêk tîne. Her wiha, komên mirovan jiyana xwe bi nêçîrvanî û komkirina şînatiyan diborandin. Lê di dawiya vê serdemê de, qeşa li ser rûyê erdê kêm dibe û li ser rûyê erdê rewşa avhewayê hêdî hêdî, vediguhere rewşa avhewaya roja me ya îro. Li şkeftên herêma Colemergê, gelek bermahiyên vê serdemê hene.




Alavên keviriî yên serdema Mezolîtîkê

## **NEOLÎTÎK** (Serdema Kevirî ya Nû 12.000 - 4.000 B.Z):

Bi germbûna hewayê û helîna qeşayê re, mirovên ku jiyana xwe di şkeftan de, diborandin, hêdî hêdî, derketin derveyî şkeftan. Li beravên robaran, di cihên ku ji bo jiyana wan desdayî û bi kêrî çandiniyê dihatin, gundên yekem ava kirine. Şoreşa Neolîtîkê li ser sê bingehan ava bûye:

* Çandinî
* Avakirina gundan
* Kedîkirina lawiran



### 1. Çandinî:

Li cîhanê, cara yekem çandinî li Kurdistanê bi pêş ketiye. Mirovan destpêkê genim, ceh û nîsk çandine. Her sê berhem jî nêzî 10.000 sal B.Z li Rihayê (bakurê Kurdistanê) hatine çandin.

## 2. Avakirina gundan:

Di cîhanê de, gundên herî kevin ên ku arkeologan vedîtine li Amed – Erxenî – Çayonû (bakurê Kurdistanê) ne. Nêzî 11.000 sal B.Z hatine avakirin.

## 3. Kedîkirina lawiran:

Li gorî lêkolînan, kedîkirina lawiran, destpêkê li Kurdistan û xeta Kenanê (Filistîna îro) bi pêş ketiye. Nêzî 11.000 B.Z bizin, mih, çêlek û kûçik di demên cuda de, hatine kedîkirin.

Mirov dikare bibêje ku ji bo niştecihbûnê pêdivî bi çi hebû, di vê demê de, hatine vedîtin. Berhemên ku di dema Neolîtîkê de, hatine çêkirin, bandora xwe heta sedsala 16'an berdewam kiriye. Piraniya amûrên ku di vê demê de hatine çêkirin, peyda bûne.

Ji destar bigire heta firaxên xwarinê, ji avahîsaziyê bigire heta çêkirina cil û bergan, bikaranîna kanzayan û gelek afirandinên din di vê pêvajoyê de, hatine çêkirin. Her wiha mijûlbûna bi stêrknasiyê ve bi pêş ketiye. Nirxandinên Gordon Child (Gordon Çayld), ên derbarê vê demê de, pir girîng in. **Gordon Child** dibêje: "Pêşketinên piştî sedsala 16'an berdewamiya pêşketinên ku di dema Neolîtîkê de, çêbûne û ev nirxandin rastiyekê vedibêje"

## Bandor û encamên Serdema Neolîtîkê:

Serdema Neolîtîkê, di dîroka mirovahiyê de, şoreşa herî mezin û ya yekem e. Pir dîrokan di hundirê xwe de, dihewîne. Bi taybetî di guhartina mirov û civakbûnê de, gaveke mezin tê avêtin. Ev serdema ku weke tovika bingehîn a mirovahiyê tê pejirandin û hîn li gelek deveran bandora wê berdewam dike. Di roja me ya îro de, ev şoreş bingeha her tiştî pêk tîne. Nirxên ku bi pêşengiya jinê, hatine afirandin di heman demê de, lawirên ku hatine kedîkirin û pêşketina amûran, pêşketina civakê jî diyar dike.

Ev jî bi xwe re, çanda xwedawendiyê diafirîne. Şoreşa Neolîtîkê, li Mezopotamyayê tê jiyîn. Vê yekê bi xwe re çanda Tilhelefê ava kir. Serêkaniyê navenda vê çandê ye. Sazîbûna yekem di vê çandê de hatiye jiyîn. Di civaka Neolîtîkê de, perestgeh, bi pêşengiya jinê, tên avakirin. Ev parestgeh, sinceke

bawerî û rêzgirtinê çêdikin. Ev perestgeh, hem weke nexweşxan e, hem jî weke cihên agahdarkirinê ne.

## Hin taybetiyên Serdema Neolîtîkê:

1. Mirovahî cara yekem, dest bi jiyana niştecihbûnê dike.
2. Şoreşa çandiniyê pêk hatiye.
3. Hemû saziyên civakibûnê di vê serdemê de, ava bûne.
4. Pergalên baweriyê, xwe bi sazî kirine.
5. Rêgezên jiyanê diyar dibin.
6. Di zanist û zanabûnan de, sazîbûn çêbûye.
7. Di vê serdemê de, amûrên çandinî û yên malê yên destpêkê, hatine afirandin.
8. Di vê serdemê de, kedîkirina lawiran bi pêş dikeve.
9. Di vê serdemê de, cara yekem, karîgeriya kanza û keviran, pêk hatiye.



## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Di civaka xwezayî de, girîngiya Mezolîtîkê çi ye?

2. Serdema Neolîtîkê, bi çi tê naskirin?

3. Bandora Şoreşa Neolîtîkê, li mirovahiyê, rave bike.

WANE 6

# BERHEMÊN ŞOREŞA NEOLÎTÎKÊ LI KURDISTANÊ

## Perestgeha Xerabreşkê:


Li bakurê Kurdistanê, nêzî gundê Xerabreşkê ye ku 15 km, li bakurê bajarê Rihayê dikeve. Di destpêka Serdema Neolîtîkê de, wek perestgeh hatiye bikaranîn. Li gorî lêkolînan bermahiyên Xerabreşkê digihêjin 12.000 B.Z. Di dîrokê de, Xerabreşk, wek perestgeha yekem, hatiye dîtin. Peykerê ku lê hatiye dîtin mîna tîpa (T) ye û li gorî erkologan nîşana, mirov e. Giraniya kevirên vê perestgehê dighêjin heta 40 tonî.



Perestgeha Xerabreşkê

Li ser dîwarên vî peykerî, wêneyên hin lawiran hatine çêkirin. Mîna: beraz, rovî, mar, şêr, ga, kovî, quling û hin lawirên xişinde. Sedema nîgarkirina van wêneyan jî nediyar e. Dibe ku nîşaneyên baweriya wê demê diyar dike,  yan jî weke zimanê nivîsê hatibe bikaranîn. Ji ber tarîkirina ku bi ser de hatiye û hewildanên veşartina rastiya wê, ev perestgeh ji **% 2** tenê tê de hatiye kolandin û bi giştî nehatiye vekolandin. Sedema vê yekê jî ev e ku gelek lêkolînên berê yên ku mijara wan mirov û destpêka mirovahiyê bû, wê bên valaderxistin.

## Çemê Koteberê:



Gundê Koteberê

Çemê Koteberê, nêzî gundê Hîlarayê yê girêdayî Erxeniyê ye. Di sala 1963'yan di encama erdkolanên ku hatine kirin de, hatiye vedîtin. Erdkolanên şûnwarnasiyê, nîşan didin ku ev qad, bûye qada herî kevin a bicihbûnê. Belgeyên ku ji erdkolanên şûnwarnasiyê hatine bidestxistin, nîşan didin ku 9.000 B.Z li vê derê bicihwarbûn pêk hatiye. Şoreşa Neolîtîkê ya ku mirov dikare bibêje, şoreşa çandinî û gundewariyê ye, bi hemû taybetiyên xwe ve, li vê derê hatiye jiyîn.

Hin destkeftî û pêşketinên girîng ên ku mirov dikare weke pênaseya destkeftiyên destpêka dîrokê bi nav bike, hatine bidestxistin. Li vê derê, mirovahî ji nêçîrvanî û komkirinê, derbasî çandinî, kedîkirina lawiran û şivantiyê bûye. Di serî de, mih, bizin û hin lawir hatine kedîkirin û diyar bûye ku hin berhemên çandiniyê, weke genim hatine çandin. Libên genim ên ku di erdkolanan de, hatine bidestxistin, diyar dikin ku ew di 8.500 B Z. de, hatine çandin. Bi rêya vê erdkolanê, diyar bûye ku ew libên genim ên herî kevin ên dîrokî ne.

Her wiha, tiştên di encama erdkolanê de derketine, diyar dikin ku ev der, wek gund hatiye sazûmankirin. Şkeftên biwêne û yên bêwêne hatine dîtin. Malên ku di keviran de, hatine çêkirin

hene. Hin malên ku li ser wan ava bûne jî hene û hin cih wek perestgehên xemilandî, hatine dîtin. Her wiha, peykerên ku ji kîlê hatine çêkirin, diyar dikin ku li vê derê pêşketinên hunerî çêbûn e.

## Gundê Çemê Xalan:


Li bakurê Kurdistanê, li bakurê bajarê Êlihê, li ber ava Dicleyê, cih digire. Di destpêka Serdema Neolîtîkê de, navendeke sereke ya cîwarbûnê ye. Li gorî lêkolînan, bermahiyên Çemê Xalan digihêjin 11.000 B.Z. Navenda ku herî zêde di çêkirina firaxên seramîk ên biwêne de, balkêş e.



Gundê Xalan

## Newala Çorê:

Newala Çorê, yek ji qadên bicihbûnê ya ku dikeve navbera navçeyên Sîwerek û Hîlwanê ku nêzî Çemê Feratê ye.



Newala Çorê

Bi çêkirina bendavan, ev bermahî di bin avê de mane. Tiştên ku di erdkolanan de, hatine dîtin, diyar dikin ku weke gundiyan jiyane. Di erdkolanan de, diyar bûye ku di binî de, şopa pêvajoya Neolîtîkê ya bi amûr û firax û li jora wê jî şopa pêvajoya Romayê heye. Ev destkeftî, diyar dike ku di vê qadê de, pêvajoyeke demdirêj a bi hezarên salan jiyana xwe domandiye, heye. Her wiha, çandinî

pêk hatiye û lawir hatine kedîkirin. Diyar bûye ku li vê derê genim, nîsk û bezelye hatine çandin.

Tiştên ku li Newala Çorê hatine dîtin, diyar dikin ku li vê derê bicihwarbûn pêk hatiye. Avahî, bi bilokên ji kevir û heriyê, di nava sazûmaniyekê de, hatine çêkirin. Tiştên ku li vê derê hatine dîtin, vedigerin 10.000 sal B.Z. Her wiha, peykerên jin, mêr û lawiran ên ku ji kîlê hatine çêkirin, hene. Hin peykerên lawiran ên ku ji gêçê hatine çêkirin jî, hatine dîtin. Di erdkolanan de, hin tiştên ji sifir ên ku di dîroka 7.500 B.Z de, hatine çêkirin hene. Dîtina morîkên sifirî yên ku hatine siqakirin, diyar dike ku mirovên li vê derê pir ne li pêş bin jî, lê di kanzayan de têgihaştî ne.

## Gundê Erîhayê:


Li xaka Kenanê (Filistîn) nêzî Çemê Urdinê, bakurê Deryaya Mirî cih digire. Di Serdema Neolîtîkê de, navendeke sereke ya çanda samîtîkan bû. Li gorî lêkolînan berhemên Erîhayê digihêjin 9.000 B.Z.



Bermahiyên Erîhayê

## Gundê Çermoyê:

Li başûrê Kurdistanê, 35 km li rojhilatê bajarê Kerkukê ye. Di Serdema Neolîtîkê de, bûye navendeke sereke ya çandiniyê. Li gorî lêkolînan bermahiyên gundê Çermoyê, digihêjin 7.000 B.Z.



Bermahiyên Çermoyê

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Peykerên ku li Xerabreşkê hatine dîtin, çi nîşanî mirovan dikin?

2. Şoreşa çandinî û lawirvaniyê li Çemê Koteberê, binirxîne.

3. Şopa Neolîtîkê ya li Newala Çorê, bi çi awayî bû?

WANE 7

# DÎROKA ÇÊBÛNA HOZ Û ÊLAN

Hêza klan û malbatê ji bo çarekirina pirsgirêkên hilberîn û ewlekariyê têrê nakin, ji ber vê yekê pêwîstî bi avakirina hoz û êlan dîtine.

Hoz: Ew kakilên civakê ne. Ne tenê li ser girêdana xwînê hatine avakirin, lê belê ji bo parastin û hilberînê jî pêwîstiyeke neçarî bû. Hoz xwe dispêre zimanekî hevbeş. Her wiha nîvkoçer û nîvniştecih in. Perestgeha wan a hevbeş heye û ji bo miriyên xwe, goristan çêkirine. Piştî klanan, pergala hozan pergala civakî ya herî bibandor û demdirêj e.

Êl: Weke cureya fedrasyoneke komcivakên hozan e. Hebûna xwe, di rêjeya mezin de, li dijî êrîşên şaristaniyên koledar, parastine. Ji bo ku tune nebin, rêxistina êlê afirandine. Lê piştî ku pergalên deshilatdar li pêş ketine, ev formên civakî hinekî ji rastiya xwe dûr ketin û deshilatdaran ji bo berjewendiyên xwe, ew bi kar anîn.


## Cih û girîngiya Mezopotamyayê di civaka xwezayî de:

Beriya milyonên salan, cureyên mirovan piştî Rîfa Efrîkayê, pêl bi pêl li cîhanê belav dibin. Cihê ku weke Kevana Zêrîn, hatiye binavkirin (rêzeçiyayên Toros û Zagrosê) dibe bingeha kombûn û belavbûna mirovan li cîhanê. Ji geliyê Rîfayê heta vê kevanê, pêl bi pêl dihatin. Ev cih, hem avhewaya wê ya guncaw, hem jî demsal ji bo pêşketina civakan, destdayî bû.

Her wiha zeviyên xwezayî pêk hatine û ji aliyê dexlûdan û fêkî ve jî pir dewlemend bû. Di nava xwe de gelek lawirên ji bo nêçîrê digire û gelek şkeftên ku weke stargeh tên dîtin, peyda bûn. Xwediyê cihekî têr çem, robar û avên cur bi cur e. Mezopotamya, xwediyê cihekî dewlemend e; her tişt lê tê çandin. Ji ber ku her çar demsal bi rêkûpêk lê tên jiyîn û axa wê

gelekî dewlemend e. Kevana Zêrîn, ji bo çêkirina zeviyan û çandiniya zeytûn, fistiq, çilo, hemû fêkî û genim, guncaw e.

Di serî de, kedîkirina lawirên kovî yên mîna: mih, bizin, çêlek, beraz, kûçik û hwd, her wiha cureyên lawiran ên weke keriyan bi hev re dijîn. Di bilindahiya çiyayan de, daristanên berfireh hene. Cihwarbûn, li ber beravên çem û robaran di cihên pir guncaw de, pêk tê. Kevana Zêrîn, piştî Rîfaya bakurê Efrîkayê, bûye cihê duyem ê kombûna mirovan.




Di qontarên rêzeçiyayên Toros û Zagrosê de; li cihê ku jê re dibêjin Kevana Zêrîn, çanda Neolîtîlê dest pê dike. Deştên Mezopotamyayê, rista dergûşa pêşketina mirovahiyê dilîzin. Di dîrokê de, vê erdnîgariyê gelek civak têr kirine û ji civaka Neolîtîkê ya 12 hezarsalî re, dayîktî kiriye. Pêkhatina civaka xwezayî, demeke dirêj bûye çavkaniyeke bingehîn.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Hoz li ser çi bingehî hatine avakirin?

2. Çima rêxistina êlê hatiye avakirin?

3. Cudahiya di navbera hoz û êlê de, diyar bike.

4. Mirovahî deyndarê qontarên çiyayên Toros û Zagrosê ye. Şîrove bike.

# BEŞA 3

- Çand û zimanê aryenî
- Tilhelef
- Çand û zimanê semîtîkî
- Çanda Elubeyd

WANE 1

# ÇAND Û ZIMANÊ ARYENÎ


Peyva "Aryen", tê wateya kesên xwediyên zevî û erdan. Di kurdî de Arî, bi wateya ax, cih û zeviyê, tê bikaranîn. Yên ku destpêka Kevana Zêrîn ji cotkariyê re, vekirine aryenî ne. Mirov dikare wan weke afirînerên cotkariyê, bi nav bike. Di vê pêşketinê de, av, ba, hewa, erdên biberket, cureyên lawiran û şînatiyên cur bi cur, rista xwe lîstin e.

Kevî û devên gelek çem û robaran, ji bo avakirinê guncaw bûn. Bi vî awayî, zimanekî berfireh "koma zimanê aryenî" derketiye holê. Ev koma ziman, weke çand heta Hindistan û beravên Ewrûpayê, belav bûye. Li gorî tê peytandin û bawerkirin koka zimanê aryenî, ji hind-ewrûpî ye, lê ev nerîn ne di cih de ye; ev nerîna sîstemên deshiladar e. Hindistan û herêma bakûrê Deryaya Reş, qiraxên Rûsya, Zozanên Îranê, di navbera her duyan re, derbas dibe. Koka wê, ji Devera Kakil a Kevana Zêrîn e.

Sumeran, navê aryen ji bo vê koma civakî bi kar aniye. Ar-erd, bi zimanê sumerî, tê wateya cot û erdê ku tê cotkirin, an jî zeviya ku tê cotkirin. Bi pêşketina civakî re, ev komên çand û ziman jî bi pêş ketine. Zimanê yekem ê arî, xwediyê nasnameya civakê ya yekem e. Di nava kurdan de, bi pêş ketiye û di wateya gotinê de, weke: cih, ax û zevî tê bikaranîn. Di heman demê de, aryen, xwediyê hilberînên çandiniyê ne.
Di navlêkirin û watedarkirina hilberînan de, xwediyê pêşketinekê ye, dîroka devokî li vir dest pê kiriye. Hilberînên bingehîn: teker, dîzik, kuzik, kêr, gîsin û gelek berhem hatine binavkirin. Dema ku ev tên binavkirin, bingeha ziman jî çêdibe. Cihên ku ev vegotina devokî ya pêşketina ziman lê çêbûye: Çemê Xalan, Çemê Koteber, Waşûkanî an jî Aşokanî ye. Hin gotinên ku çavkaniyên xwe ji wê demê digirin, ev in: war, ax, zevî, jin, roj, bira, mur, sal, ga, giran, meş, gud (xweda) û hwd.

# ÇANDA TILHELEFÊ

Weke tê zanîn, çanda Tilhelefê di navbera salên (6.000-4.000 B.Z) de, bi pêş ketiye. Dikare weke dema bipergalbûn û gihaştina Şoreşa Neolîtîkê, were nirxandin.
Ji dema borî bêhtir, mora xwe li dîrokê xistiye. Mirov vê demê, dikare weke şoreşa hezarên salan, binirxîne. Di guherîn û veguherîna civak û niştecîhbûnê de, risteke girîng û taybet lîstiye. Neolîtîk, weke şoreşa çandinî û gundîtiyê jî tê pênasekirin ku asta wê ya herî jor, çanda Tilhelef e. Wê bandoreke pir mezin li çandên derdora xwe jî kiriye.
Vedîtinên girîng ên çanda Tilhelefê pir in. Mîna: bivir, haletên cot, raçandin, hêrandin û teker. Her wiha stêrk, dîzik û xilik bi kar anîne. Xilikên Tilhelefê ji aliyê şêwe, cure û awayê biraştina wan, gihaştibûn asteke pêşketî. Ev xilik, di atûnên ku pileya germahiya wan digihaşt 1200'î, dihatin biraştin û bi reng û wêneyên xwe, balkêş bûn. Rengên weke pirteqalî, qirmizî, sor, qehweyî û zer, bi kar dianîn. Her wiha dîzikên xwe ,bi şêweyên gewmetrîkî û bi wêneyên mirov, lawir, firinde û şînatiyan dixemilandin. Mirovên Tilhelefê, bi çêkirina alavên kevirî pêşketî bûn û sifir ji bo hin tiştan bi kar dianîn, nemaze ji bo gerdeniyan.




Xilikên Tilhelefê

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Peyva aryen, tê çi wateyê?

2. Civaka aryenî, bi çi tê naskirin?

3. Çima Tilhelef, weke lûtkeya Neolîtîkê tê naskirin?

4. Hin berhemên Tilhelefê, binivîse.

WANE 2

## ÇAND Û ZIMANÊ SEMÎTÎKÎ

Dema Şoreşa Çandiniyê li bakurê Mezopotamyayê bi pêş dikeve, li başûrê Mezopotamyayê jî çanda semîtîkî, peyda dibe. Çanda semîtîkî, ji Biyabana Mezin heta rojhilatê Erebistanê û heta bakurê biyabanê, belav bûye.

Beriya 6.000 sal, li Erebistanê daristan û şînkayî, hebûn. Ev rewşa erdnîgarî, ji bo jiyana mirovan, desdayî bû. Li gorî agahiyên ku bi dest ketine, ev erdnîgarî xwediya daristanên dewlemend bû. Ji ber ku ev der ji cotkariyê re, negûncaw e û bêtirî wê jî li vir lawir peyda dibin û şivantî bi pêş dikeve.
Di nav semîtîkan de, mêr serwer e. Hin hozên semîtîkan ji çanda aryenan bandor dibin û dest bi cotkariyê dikin. Zimanê Semîtîk, ji hêla civaka ereb û cihûyan ve, tê bi kar anîn. Di nava çanda semîtîkî de, bingeha olên yekxwedayî, tê avakirin.



# ÇANDA ELUBEYD

Çanda Elubeyd, di salên 5700'î B.Z de, li Mezopotamyaya jêr bi pêş dikeve.

Bi bandor û pêşketinên çanda Tilhelefê re, bi pêş ketiye. Hîmên bajêr û bajarokan tên danîn û gavên destpêkê tên avêtin.

Di çanda wan de, herî zêde bandora baviksalariyê heye. Çandeke ku li dora malbat û malên mezin, xwe hûnandiye û destpêka pergala xanedaniyê ye. Li derveyî asta jor a hiyeraraşiyê, yên din hemû bi awayekî pergalî, tên kolekirin, ango pratîk û awayê cîhaneke wisa tê çêkirin ku cara pêşî hîmê pirsgirêka civakî, tê danîn.

Rastiyeke din jî heye ku Mezopotamya pêşenga vê pergala cîhanî ye, koka bîrdoziya malbat û xanedaniyê ye. Li Rojhilata Navîn ev her du sazî hîn jî gelekî bihêz in. Ev yek ji nêz ve ,bi vê rastiya dîrokî ve, têkildar e. Ev saziyên herî kevin ên civakê bi pêşengiya mêr, li tevahiya dîrokê, her tim bi pêş ketine. Malbat jî bi giştî vediguhere şaneya bingehîn a fermî ya civakan.

Di tevahiya dîrokê de, ji bo damezirandin û hilweşandina xanedan û malbatan, şerên deshiladariyê yên ku hatine kirin, bêsînor û hesab in. Bi van şeran, ne tenê civakan vediguherînin çavkaniya pirsgirêkan, di heman demê de, bêhna wan diçikînin.


Xilikên Elubeyd

Bi awayekî berbiçav em texmîn dikin ku ji 4300'î B.Z ve, Çanda Elubeyd a bi koka ji Mezopotamyaya Jêrîn e, bandorê li Çanda Mezopotamyaya Jorîn dike. Çanda Elubeyd, bi civaka hiyeraraşîk a ku li dora xanedanên bihêz pêk tê, ji çandên berê yên hozan cuda dibe.

Dema koloniyên sumeran tên destpêkirin. Ji bo vê demê, dikare were gotin ku Ûrûk, mînaka yekem e. Bi Çanda Elubeyd ve

girêdayî, kolonî tên avakirin. Koloniyên bajarê sumeran ên Ûrûkê di 3500'î B. Z de ,dest pê dikin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çanda samîtîkî, li ku û li ser çi ava bûye?
2. Çima hîmên bajar û bajarokan, di Çanda Elubeyd de, hatine danîn?
3. Bandora Çanda Elubeyd, li ser Çanda Tilhelefê, rave bike.


# BEŞA 4

- Şaristanî
- Sumer
- Ekad û Babil
- Aşûr
- Misir
- Çîn
- Hindistan
- Amerîka

WANE 1

# ŞARISTANÎ

Şaristanî, civaka ku di qonaxa çînîtî, bajarbûn û dewletê de derbas bûye, pênase dike. Şaxên bingehîn ên zanista civakî ( şûnwarnasî, etnolojî û teolojî) bi lêkolînên berfireh ên ku di sedsala borî de kirine, gihiştiye vê encamê, civaka yekem a bidewlet, xwediyê dîroka nivîskî û şaristaniyê ye, civaka sumerî ye. Dema em bînin ber çavan ku demeke dirêj, dîrok weke saziyên civaka bidewlet hatiye desgirtin, ev pêşveçûn; dibe pêşveçûna dîrokê ya herî mezin. Dewlet, şêweyê serdestiyê ye. Ew li ser hilberîna keda mirovan a ku tê guhartin, hatiye



Zîgûrat

damezirandin. Ji ber vê yekê, bi naskirina sumeran, em ê xwe û roja xwe baştir nas bikin.

Şaristanî, rê li ber keda mirovan a hilberîna zêde, vedike û dibe mijara têkiliyên koledarî, ango mewdanê. Şêweyê ku sumeran

pêk aniye, damezirandina zîgûratên rahîban e. Ev zîgûrat hem perestgeh, hem cihê karê hevbeş, hem jî navenda rêveberiya civakê ye. Ev navendên ku nasnameya civakê bûn, xwe di wateyeke pîroz de dibînin; xwe weke nûnerê sazûmaniya asîmanî ya li erdê didîtin. Di pêvajoya dîroka şaristaniyê ya vê dawiyê de, dibin pêşemînaka perestgehên mezin. Vedîtina ku jê re dibêjin dewlet ango zîgûrat, bi rahîbên ku îdeologên wê demê bûn, rê li ber berhemdariyeke mezin, vedike. Di hişmendiya dewletê de, wan pîroz dibînin û weke nûnerên sazûmaniya asîmanî ên li ser rûyê erdê, di ramanên mirovan de, serwer dikin û dibin jêderên desthilatdarên pêşveçûyî.

Wekî ku tê zanîn, Şaristaniya Navendî ya yekem, ji Sargonê Ekadî  dest pê kiriye û weke zincîrekê heta îro domandiye. Hegemoniya Sumer, Ekad, Babil, Aşûr, Hîtît, Mîtan, Urartu, Med, Pers, Iskender, Roma, Sasanî, Bîzans, Ereb-Islam, Turk-Moxol, Osmanî, Birîtaniya û Amerîkaya roja îro, çemên sereke yê şaristaniyê, pêk tînin.

## Berxwedana şaristaniya demokratîk, li hember şaristaniya navendî:

Têkoşîna mirov a yekem, têkoşîna ji bo xweparastin û jiyanê ye. Mirov dikare yekîtiya mirovan a piştî navendîbûnê, weke hevgirtin û raperînekê ku sîstema nû ya ku baviksalariyê napejirîne, pênase bike. Ew têkoşîneke li beramberî çînparêzî û zordariyê ye.
Mirov di serdemên kilan, hoz û êlan de, raperînan nabîne. Ji ber ku hîn çînbûyîn çênebûye. Hilberînên ku tên çêkirin li gorî pêdiviyan in.
Dîsa li pêşberî derve, xweparastin di heman demê de, bi yekîtiya navxweyî ve, ava dibe. Ji vê girîngtir ji bo hilberîneke baş, pêwîst e civak bi hev û du re, tev bigere. Ji vê jî tê têgihiştin ku dema cudabûn di navbera civakan de tunebe, bingeha raperînan jî çênabe

Raperîn bi destpêkirina çînan re, dest pê kiriye. Zêdebûna hilberînê, bûye sedem ku çavberdana li hilberînên zêde, çêbibe. Kombûna hilberînê di destekî de, pergala serdestî û koledariyê bi xwe re, aniye. Çînayetiyê jî, bi xwe re, di nav kom û kesan de, newekheviyek ava kiriye. Di encama newekheviyê de, nepejirandin di navbera kes û koman de, derketiye. Ev jî bûye sedem ku raperîn çêbibin.
Koletiyê di serî de bandora xwe, li civakên ku bi çandiniyê, jiyana xwe didomandin kiriye, di civakên koçber de, çînayetî kêmtir e. Bi pêşketinên bajaran re, di navbera bajar û hozan de, pevçûnên dijwar çêbûne. Ji ber ku bajaran xwestine hilberînên zêde bi dest bixînin, ji bo vê çavberdana hilberînên di destê hozan de, çêbûye. Hozan jî li himberî van destwerdanan serhildan pêşxistine. Koledariyê, xwe bi zorê li ser koleyan nade pejirandin û ji bo ku li dijî wan, raperîn zêde bi pêş nekevin, xwe bi hinek formên bîrdoziyê, dide rewakirin. Zîgûratên sumeran, bi piranî ev erk girtibûn ser xwe. Bi rêka zîgûratan, koletî di hizrê mirovan de, dihat bicihkirin. Ev jî rêbazeke ku pêşiya rapêrînan digire.
Di bingeha serhildanan de, lêgerîna dadê û wekheviyê heye. Encamên raperînên di civaka çînayetî de, ji nepejirandina rewşa ku tê de ne. Ev ji destpêkê ta niha hatiye û bi şêwazên cuda cuda bi pêş ketiye û ew jî ev in:

1. Berxwedana jinê.
2. Berxwedana bawerî û pêximberan.
3. Berxwedana koleyan.
4. Berxwedana gel, hoz û êlan.

Ev berxwedan ji bo ku herikîna çemê dîrokê vegere rewşa xwe ya normal, çêbûne.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Şaristanî tê çi wateyê?


2. Ji çemê şaristaniya navendî, mînakan bide.

3. Di dîrokê de berxwedan û raperîn bi çend rêbazan çêbûne? Hin mînakan bide.

WANE 2

# ŞARISTANIYA SUMERAN

Sumer, hem weke civakekê, hem jî weke şaristaniyekê hatiye binavkirin. Li gorî hin zanînan, sumer navê herêmê, yan jî yê erdnîgariyekê ye. Cihê derketina sumeran, Mezopotamyaya Jêr e. Di navbera çemên Dîcle û Feratê de, li başûrê Iraqa îro, dîroka sumeran dest pê dike. Navê welatê wan, Kalama ye. Wateya wê, welat an jî parçeyê erdê ye. Di dîrokê de, sumerî ji 5000 sal B.Z û bi şûn de, hatine dîtin.




Li vê derê, şaristaniya yekem a dewletî û koledarî ava kirine. Bajarên bi navê Ûrûk, Ûr, Nîpûr, Lagaş û hwd, ava kirine. Çanda şaristaniya dewletî û koledarî, bi rêya koloniyan li derdora xwe belav kirine. Pergala asîmanî, wek mînak tê girtin û li ser vî bingehî, pergala dewletê tê avakirin.

Zîgûrat jî bi vî awayî li ser vî bingehî hatiye avakirin. Qata jor a xweda ye, ya jêr a kole û civakê ye û ya navîn jî navbeynkar e (di navbera wan de ye) û ji rahîban re hatiye hiştin. Bi vê rêyê pergaleke pir cuda derdikeve. Di nava siberoja dîrokê de, cih digire û pirsgirêkên mirovahiyê yên desthilatdariyê jî li ser vî bingehî, dest pê dikin. Piştre, yên ku li ser pergala desthilatdar û dewletparêziyê meşiyane, sumer lasa kirine. Ji ber vê yekê,

mirov dikare bêje ku di avakirina dewletê de, rista sereke ya sumeran e; an jî berhemên wan e.
Sumerî, xwediyê şaristaniya destpêkê ne. Ji bo pêşketina şaristaniyê, pêdivî bi çi hebû, hema bêje piranî ava kirine: zîgûrat, dewlet, rahîb, efsane, bajar, nivîs, bazirganî, artêş, çînîtî û hwd. Jêdera şaristaniya koledar a 5000 salî, sumer in; ango zîgûratên sumeran in.
Wekî ku tê zanîn Şoreşa Neolîtîkê ya ku li Mezopotamyaya Jor bi pêş ketibû, berhemên mirovahiyê heta wê demê vedîtine û peyda kirine. Sumeran jî ev ji bo xwe bi kar anîne; sentezek ava kirine, hem bi pêş xistine û hem jî xistine bin xizmeta xwe.

## Di dema sumeran de, destan û zayendperestiya yekem:



**Gilgamêş**

Tê zanîn ku beriya sumeran, Şoreşa Neolîtîkê hatibû jiyîn. Sumeran, li ser hilberînên jinê, xwe saz kiribûn. Çandinî, kedîkirina lawiran û avakirina gundan ji wir girtibûn û ji wir fêrî çêkirina alavên xwarinê û aşê genim jî bûbûn. Heya wê demê berdewamkirina jiyanê, ji aliyê jinê ve, dihat meşandin. Sumeran, efsane bi pêş xistine û bi van efsaneyan re, pergalek ava kirine. Tiştên ku li ser rûyê erdê diqewimin, şer û pevçûnên ku di nava civakê de, tên jiyîn, bi rêya efsaneyan vegotine. Efsaneyên herî bi nav û deng, ên ku di navbera, Xweda Enkî û Xwedawend Înana de, derbas bûne. Ew efsane, serketina mêr ji

sedî sed misoger neke jî lê ber bi deshiladariya mêr ve, pêvajoyeke girîng nîşan dide. Berhemên jinê yên dîrokî, bi giştî çawa ji destê wê hatine girtin, ango di vê mijarê de, helwest li ser çi bingehî çêbûye, di vê efsaneyê de, xuya dike. Cara yekem di dema Sumeran de, berhemên jinê ji dest wê tên girtin û jin li malên xerab bi kar anîne.

## Hiqûq û avakirina desthilatdariyê:

Sumeran, kar û barê ku kirine, bi rêya hiqûqê bi rêkûpêk kirine. Hiqûq, cara yekem di dema Sumeran de, hatiye danîn. Qral-xwedayê bi navê Ûrnamû, cara yekem bi navê xwe, zagon derxistine. Ji bo ku şaristaniyek li ser çînayetiyê bê avakirin, hiqûq di asta herî pêş de ye. Eger têkiliya klanan a ku bi rêya sincê dihat meşandin, hebûna xwe domandiba, ne dewlet û ne jî şaristaniyê dikarîbûn li ser çînayetiyê û desthilatdariyê hebûna xwe bi pêş xistibana. Ji ber vê yekê, pêwîst bû ku li şûna sincê, hiqûq bihata bicihkirin û civak, li gorî jor û jêr, jin û mêr û hwd, ji hev û du bihatana qutkirin, parçekirin û bi vî awayî desthilatdarî bihata damezirandin.

Hiqûq, li ser bingeha mewdanê tê avakirin, civakê parçe dike û li himberî hev û du derdixe. Bi vî awayî civaka jor û jêr, ji desthilatdariyê re rêya rewabûnê vedike, çînayetiyê mîsoger dike û wê weke fermana Xweda nîşan dide. Hiqûqa ku Ûrnamû nivisandiye, piştre ji aliyê Hemorabî ve hatiye berfirehkirin.

## Berhemên sumeran:

Gelek vedîtin û berhemên sumeran ên ku ji dîrokê re mane, hene. Ev vedîtin her çi qasî hişmendiya dewletî ava kiribin jî, heya niha tên bikaranîn. Gavên pêşketî di dema sumeran de:



Nivîsa Mîxî

1. Afirandina nivîsê: Sumeran 3.500 B.Z nivîsa mîxî afirandine. Ev nivîs bi rêya tabloyan gihîştiye roja me ya îro.
2. Şopandina stêrk û tevgerên asîmanî hatin bipêşxistin.
3. Ji ber pêwîstiyê û hesabên rojane, bîrkarî hat bipêşxistin.
4. Sumeran, salname û endezyarî, li pêş xistine.

Tevî hemû sûdên ku ji hêla sumeran ve, li mirovahiyê hatiye kirin, hin xalên wan ên ku sîstema xwezayî dane guhertin û ziyan li civakê kirine jî hene, mînak:

1. Dewlet û saziyên dewletî ava kirine.
2. Di dema sumeran de, mewda (mulkiyeta taybet), berfireh bûye û dewlet jî li ser mewdaya taybet ava bûye.
3. Kolekirina mirovan hatiye bipêşxistin.
4. Di dema sumeran de cara yekem zagonên nivîskî, li ser ber, kevir û zinaran hatine nivîsîn.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Pergala asîmanî ya sumeran, lêkolîn bike.
2. Çima sumeran hiqûq dane pêş?
3. Hin berhemên sumeran ên ku sûd li mirovahiyê kirine, bîne ziman.
4. Tevî pêşketinên ku sumeran pêşkêş kirine, li civakê hin ziyanên wan jî hebûn, şîrove bike.

WANE 3

# EKAD Û BABIL

## 1. Şaristaniya ekadan (2.350- 2.150 B.Z)

Di sala 2.350 yê B.Z de, hatiye avakirin. Sînorê Şaristaniya ekadan ji Kendava Besrayê heta Anatoliyayê, ji welatên Îlamê heta Deryaya Spî ye. Ekad, bixwe ji nijada samîtîk in û ji zimanê sumerî bandor bûne.

Bingehê şaristaniya xwe ya navendî ji çanda Elubeydê girtiye û piştre şaristaniya sumeran rûxandine. Artêşa yekem a herî mezin di dîrokê de, ava kirine.




Di dema ekadan de, li şûna hêza olî, hêza artêşê li pêş ketiye. Dema qiralxwedayan, an jî qiralrahiban bi dawî bûye û di dîrokê de, cara yekem, qiralê bi navê Sargon imperatoriya xwe radigihîne. Şaristaniya ekadan, pergala imperatoriya dagirkeriyê ya yekem e. Qiral Sargon di dîrokê de, xwe weke dagirkerê herî mezin radigihîne û pesnê xwe bi van gotinan dide:


"Tu kes nikare mîna min bajaran bi dest bixe û qiralê ku dikare bibe hemta û hevrêkê min, bila qada ku min zevt kiriye, bi dest bixe".
Piştî ku qiral Sargon, bajar-dewletokên sumeran rûxandin û dewleta navendî ava kir, hin gavên ku pêk anîn ev bûn:

1. Sûrên bajar-dewletokan rûxandin.
2. Serwerê her bajar- dewletokê ji hêla xwe ve erkdar kir
3. Di peymanên ku dihatin çêkirin de, navê qiral li gel navê xwedawendan, bi kar anî.
4. Di dema Bajar- dewletokên Sumerî de, her bajarek salname û cejnên wê yên taybet hebûn. Sargon, yek salname ji bo hemû bajaran bi kar anî.

Di serdema neviyê wî ( Naram Sîn) de, serwerên bajaran, xwe bi navê koleyên qiral radigihandin.

## 2. Şaristaniya babilan (2.000-550 B.Z):

Gelê Babilê ji nijad û çanda samîtîk in. Di salên 2.000'î B.Z de, ji Biyabana Erebistanê, tên bakurê Sumeran û li nîveka Mezopotamyayê cîwar dibin. Nexşe û rewşa erdnîgariya wê demê, weke Iraqa îro ye.
Babil di salên (1.950-1.600 B.Z) de, di dema xwe ya pêşî de, bi awayekî gelekî bi heybet derketiye ser dika dîrokê. Hemorabîyê navdar nîşaneya vê serdemê ye. Zagonên Hemorabî yên ku li ser navê xweda tên vegotin, di bingeha xwe de, zagonên sizayê ne. Sizaya ku nivîsiye wiha ye: "Çav bi çav e û diran bi diran e." Lê van zagonan pir ziyan li civakê kirin. Tevî ku têkiliya




zagonan bi maf û dadê re jî heye, lê armanca wê ya sereke parastina desthiladariya dewletê ye.
Dema duyem di salên (1600-1300 B.Z) de, bi civakên Bakur û Rojhilat re bi awayekî hevpar derbas bû (hevgirtinên Hîtît û Hûriyan vê yekê tîne ziman).
Dema sêyem ji salên (600-540 B.Z) di encama hevpeymana bi Medan re desthiladariya aşûran hilweşandin. Nebûxez Nesir ê ku cara pêşîn cihû mişext kirin, nîşaneya vê demê ye.
Babil di tevahiya demên xwe de, navendeke hegemonyayê ye. Hegemonya kapîtalîst a London û Newyorkê tîne hişê mirovan. Navenda pîşesazî, bazirganî, ol, huner û zanistê ye; lewma bi nav û deng e. Gotina "Heftê û du milet ji Babilê tên". girîngiya wê ji vê tê. Ji bo Yûnaniyên wê demê Parîs û Londona anha bû; wê hemû êl û hoz kişandine cem xwe. Fîlozofên wê yên pêşî, di dibistanên Babilê re, perwerde bûne. Bi kurtasî di dema xwe de, bajarê hegemonîk ê cîhanê bû.

## Şoreşa Hz. Birahîm, li hember qiralxwedayan:

Hz. Birahîm li Rihayê ji dayîk bûye û bi têkoşîna xwe, derbeyên gelekî mezin, li pergalên Sumer û Babilan daye. Van pergalan

nûnertiya şaristaniyên navendî yên dema xwe kirine. Girêdayî pergala sumer û babilan, li Rihayê sazûmaniya Nemrûd (qiralxweda) hebû. Li hemberî nûnerê şaristaniya navendî ya li herêma Nemrûdê, di bin pêşengiya Hz.Birahîm de, têkoşîn hat meşandin. Ev têkoşîn, hem li ser bingehekî nijadî, hem jî di çarçoveya kevineşopiya pêxemberan de, pêk hat. Di encama vê têkoşînê de, pûtên ku nûnertiya hişmendiya pergala qiralxwedayan dikirin, hatin şkandin.

## Şerê hişmendiyê:

Hz. Birahîm, beriya her tiştî bi êrîşkirina ser hişmendiya heyî û avakirina hişmendiyeke nû, dest bi têkoşînê kiriye. Li hember pûtên ku weke nûnerên qiralxwedayan û mîtolojiya ku di kesayeta xwedayan de, hêz dide pergala dewletê, têkoşîn kiriye. Hz. Birahîm, şevekê radihêje çakûçê xwe û hemû pûtan dişkîne. Bi vî awayî, dest bi têkoşîna xwe dike.

## Bidawîkirina qurbankirina mirovan:

Hz. Birahîm, şoreşeke din ji bo rizgarkirina mirovan ji qurbankirinê li dar xist. Di wê demê de, mirov ji bo qiralxwedayan dihatin serjêkirin. Lê Hz. Birahîm, li hember Nemrûd rawestiya û li şûna qurbankirina mirovan, beran kir qurban. Bi vî awayî, dawî li qurbankirina mirovan anî. Ev yek bi rengekî olî tê ravekirin, lê em bi rengekî dîrokî digirin dest.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ


1. Ekad di koka xwe de, kî ne?
2. Bandora kîjan çandê li Ekadan heye?
3. Babil di çend pêvajoyan re derbas bûye?
4. Armanca sereke ya zagonên Hemorabî çi ye? Mînkan bide.
5. Tekoşîna Hz. Birahîm li hember çi bû?

WANE 4

# ŞARISTANIYA AŞÛRAN

Aşûr, ji nijada samîtîk in. Di 2.000'ê B.Z de, li Mezopotamyaya Jorîn li rex Dîcle û Feratê bi cih bûne. Navenda aşûran Nînewa ye. Li başûrê wan Babil û li bakurê rojhilat Kasît hene. Li aliyê din mîtaniyan cihê xwe girtine.

Di dema şaristaniya aşûran de, bazirganî û ramyarî di yek destî de, tên komkirin û avakirin. Ji gelek çandan sûd girtine; çanda elubeydî, sumerî, ekadî û babilî ji bo çanda wan dibin bingeh.




## Hegemonya aşûran, mirov dikare li ser sê deman dabeş bike:

1. Salên 2.000-1.600 ê B.Z dema mêtingehên bazirganiyê yên bi ser Babilê ve ye.
2. Salên 1300-1000 B.Z bi temamî dema hegemoniya aşûran e.
3. Dema dawî jî salên 900-612 yên B.Z ye. Aşûriyan ji Zagrosê heta Deryaya Spî, ji Anatolyaya Navîn heta Misir û Umanê li erdinîgariyeke berfireh karîbûn bibin hêzeke hegemonîk.

Di pîşesazî û bazirganiyê de, rê li pêşketinê vekirine; aşûran berhemên çêkirî li mêtingehan difrotin û heyberên xam, vediguhestin metrepolên xwe. Aşûran di tevahiya demên xwe yên hegemon de, koloniyên bihêz ava kirine. Li rojhilat Med û Pers, li rojava Misir, Kenan, fenîkî û heta bi nava Anatolyayê karîbûn gelek begtî û mîrnişînan, bikin mêtingeh û wan bixin bin destên xwe. Lê ya balkêş ew e ku Urartu weke hêza bi tenê karîbû li dijî aşûran li ser pêyan bimîne.

Imperatoriya Aşûrî ji aliyê dagirkeriyê ve, hişmendiya Sargon bingeh digire, ango fişar û zorê li gelên herêmê dike. Mînaka wê ya ku hatiye vedîtin, belgeyên qiral Aşûrbanîbal ê ku dibêje: "Min keleh ji qehfên mirovan ava kirine".
Ji ber vê zordariyê, ji aliyê gelên herêmê ve, konfederasyonek tê avakirin. Bi destê konfederasyona ku ji gelên herêmê pêk dihat (medî, babilî, urartuyî, îskîtî...) di sala 612`yê B.Z de, deshiladarên Imperatoriya Aşûrî tên rûxandin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Dîroka şaristaniya aşûran, bi çi hatiye avakirin?


2. Mafê gelê herêmê ji aliyê vê şaristaniyê ve, çawa bû?

3. Di dema sêyem de, çi digihêje asta bilind?

WANE 5

# ŞARISTANIYA MISIRÊ

Çemê Nîlê ji başûr rojhilatê Efrîkyayê derdikeve û heta Deryaya Spî diherike. Ev çem çavkaniya jiyana çanda misirî ye. Li Bakurê Misirê, Deryaya Spî û li rojhilatê wê jî, Deryaya Sor cih digirin. Di navbera parzemînên Asya, Ewrûpa û Efrîkayê de, cih digire. Ji hemû berhemên çand û zimanên herêmê sûd girtiye. Şaristaniya Misirê di navbera (4.000-3.000 B.Z) li pêş ketiye. Hin jêmayiyên xwe, ji çanda xwedawendiyê ya dema Neolîtîkê girtiye û hin jêmayiyên xwe jî ji Sumeran girtiye. Sazîbûna hiyarerşiya deshilatê navendîtir bûye. Bi qasî 30 xanedanan ava kirine û bi şêweyên eyaletan hatine birêvebirin. Bi demê re, du şanişîn ava bûne; ya bakur û ya başûr, lê qiralê başûr (Mîna) di 3.200 ê B.Z de, her du şanişîn kirin yek û serdema xanedanan li Misirê dest pê kiriye. Misriyan zimanê qiptî bi kar anîne û heya niha hin ji wan wî zimanî bi kar tînin. Zimanên cuda jî hatine vedîtin mîna: hîrogilîfî û hîratîqî yên ku li ser Kevirê Reşîd hatine vedîtin.




Koledarî di dema Şaristaniya Misirê de, pir zêde li pêş dikeve. Bi hejmareke pir mezin, mirov hatine kolekirin. Bi taybetî, di çêkirina pîramîdan de, bi deh hezaran mirov, hatine bikaranîn. Di dîrokê de, bi qasî şaristaniya Sumer, Ekad, Babil û Aşûrî, Misir jî di derketina pergala koledariyê de, bi bandor bû.

## Bawerî:

Di dîroka Misirê de, bawerî cihekî pir girîng digire. Çanda rewanî ya mirovahiyê, di dema Şaristaniya Misirê de, ji bo kolekirina mirovan hatiye bikaranîn. Di dema koledariyê de, mirov weke koleyên qiral hatine pênasekirin. Mirov, koleyên qiral û xwedaqiralan in (ji qiralên Misirê, yên wê demê re, Fîrewn tê gotin. Fîrewn tê wateya mala xwedê. Fîrewn ne navê kesekî bi tenê ye, bi giştî qiralên Misirê bi navê Fîrewn tên binavkirin). Sîstema birêvebirina Misrê ji destpêkirina deshiladariya Fîrewnan (3.200 B.Z) şêweyê qiraliyeta mutleq girtibû. Sîstema ramiyarî ya Misirê di wan deman de, li ser ramana qiralxweda ava bûbû. Qiral xwe weke xwedayekî di nava mirovan de, didît; di çavê miletê wê demê de, ew wekî xweda HOR bû ku şêweyekî mirovî girtiye. Bi vî awayî qiralxweda HOR maf û cihê wî mîna xwedayên din, bi nirx û bandor e. Êdî wekî sermyanê gel û çavkaniya dad û wekheviyê tê pênasekirin. Di encama vê desthiladariyê de, hemû pîvan û rêgezên civakê, dixe destê xwe.

## Zanist û huner li Misirê:

Misir, di qada zanistê de, gelekî pêşketî bû. Di vedîtina hejmar, bîrkarî û geometriyê de, bi pêş ketibûn. Di dema Misirê de, avahîsazî, bijîşkî, çandinî, lawirvanî, stêrnasî û nivîsên cuda hatine bipêşxistin. Keştî hatine çêkirin. Hejmarên meh, heftî û rojan zelal kirine; salek, 13 meh in û 366 roj hatiye hesabkirin; 12 meh 30 roj in û meha 13'an 6 roj hatiye hesabkirin. Heta niha salnameya Misirê ya wê demê, tê bikaranîn.

Ev salname, ji aliyê Roma û Yûnanistanê ve jî, hatiye pejirandin û bikaranîn. Pûtên herî mezin ên wê demê, hatine çêkirin mîna peykerê Ebulhol ê navdar. Ev bixwe, avahîsazî û hunera demê ye. Her wiha, çêkirina pîramîdên qralxwedayan, ji avahîsazî û hunera hemû deman bi heybettir e. Lê belê, ev bermahî li ser keda koleyan hatine avakirin.



## Berhemên Şaristaniya Misirê:

1. Cara yekem nivîsa hiyeroglîfî ya Misirê, li ser kaxeza papîrûsê hatiye nivîsîn û heta niha gelek belgeyên Misirê yên li ser van kaxezan hene.
2. Stêrnasî û geometrî bi pêş xistine.
3. Ji aliyê bijîşkî ve pir pêşketin çêkirine.
4. Şimakirina laşê mirovan, li Misirê derketiye holê.

# HZ. MÛSA

Piştî Hz. Birahîm, pêvajoya civaka cihû li Misirê sêsed salan di nava zor û astengiyan de, derbas kiriye. Serpêhatiyeke tijî zor û zehmetî li hember sîstema navendperestiyê jiyaye. Li Misirê, Fîrewnan civak kole kiribûn û ji bo berjewendiyên xwe ew bi kar dianîn. Rêbertî û pêxembertiya Hz. Mûsa, ji bo avakirina neteweke, bi têkoşîneke nû rabûye û vê yekê bi koçberiya wî ji Misirê, dest pê kiriye.

Hz. Mûsa, hozên ibraniyan di bin yek netewê de, kom kirin. Ji bo pêkanîna wê, hewil daye ku afirandina nasnameyeke îdyolojîk a netewî çêke. Li gorî texmînan di navbera salên (1.600-1.300 ên B.Z ) de, pêk hatiye.

Tevahiya hozên cihûyan ku ji 12 hozan pêk dihat, bi xwe ve, girê dane û nûnertiya derbasbûna pêngaveke pêştir dike. Li dijî Fîrewnê Misirê derdikeve. Bi wateyeke din Hz. Mûsa, ji rizgarkirina cihûyan a ji deshiladariya koletiyê, bêhtir di bingeha rêgezên sincî yên civakî de, ber bi avakirinê ve diçe. Di nava pêxemberan de, yê ku herî zêde bi civaka xwe ve, mijûl bûye, Hz. Mûsa ye. Hz. Mûsa pir ji bo nûkirina civaka xwe xebitiye. Hewil daye ku mirov ber bi rêya rast ve, bibe û wî bi sincên pak, girê bide. Hewldaneke pir mezin daye ku teşeyekî nû bide civaka xwe. Lê tevî vê yekê jî, ji bo ku netewa xwe bi civakbûnê ve, li pey rêgezên sincî yên deh fermanên ku ji bo wî hatine şandin, birêxistin bike, xebata xwe her tim domandiye.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Yekbûna Misirê çawa çê dibe?
2. Fîrewn kî ye?
3. Bi kurtasî, zanistê li Misirê rave bike.
4. Çend berhemên şaristaniya Misirê binivîse.
5. Tekoşîna Hz. Mûsa li hember Fîrewn, ji bo çi bû?

WANE 6

# ŞARISTANIYA ÇÎNÊ

Çîn, li başûrê rojhilatê parzemîna Asyayê cih digre û xwediyê şêniya herî mezin a cîhanê ye. Ji nêvî zêdetir xaka vî welatî, bi taybetî rojavayê Çînê bi zozanên bilind û çiyayan dorpêçkirî ye. Di nava Çînê re du çemên girîng derbas dibin: Huangho (Çemê Şîn) û Yangtsî (Çemê zer) ne.




Çîn, yek ji şaristaniya navendî ya herî kevin e. Fosîlên mirovan ên dema paleolîtîkê, li nêzî paytexta wê (Pekîn) hatine dîtin.

Di sala 4.000 ê B.Z de, çanda çandiniyê bi pêş dikeve. Di bingeha çanda çandiniyê de, bandorên çanda aryenî diyar dibin. Di sala 3.000 ê B.Z de, birêveberiya ramyarî ya Çînê tê sazkirin. Imperatorî tên avakirin. Li Çînê 22 şahnişînan deshiladarî meşandine. Di şaristaniya Çînê de, gelek berhemên ku hatine vedîtin û ji bo mirovahiyê mane hene.

Cara yekem hevrîşim hatiye çêkirin. Bazirganiya hevrîşimê bûye berhemdariya demê ya herî girîng. Heta niha ev rêya bazirganiyê ya bi navê rêya hevrîşmê, ji wê demê ve maye.

Ji ber van dewlemendiyan, ji aliyê pergalên derveyî ve, di bin êrîşên cur bi cur de dimîne. Ji ber vê yekê, parastina xwe ya bingehîn, bi rêya avakirina sûran kiriye. Di dîroka mirovahiyê de, cara yekem sûrên navdar ên herî dirêj, di şaristaniya Çînê de, hatine çêkirin. Di nava heft berhemên navdar ên cîhanê de, bi navê Sûra Çînê cih digire. Di çêkirina Sûra Çînê de, bi hezarên mirovan jiyana xwe ji dest dane. Ev sûr, dirêjahiya wê 2.450 km ye, bilindahiya wê 12 metre û firehiya wê 5 metre ye.



## Berhemên Çînê:

1. Kaxez cara yekem li Çînê hatiye çêkirin û ximav hatiye bikaranîn.
2. Qalibên çapkirinê hatine çêkirin.
3. Pisûle, cara yekê li Çînê hatiye bikaranîn.
4. Hunera borselan û seramîkan li Çînê bi pêş ketiye.
5. Toza barûdê li wir hatiye çêkirin û di şahiyan de, hatiye bikaranîn.
6. Birinc, cara yekê li Çînê hatiye çandin.
7. Hevrîşim hatiye vedîtin.
8. Werdek hatine kedîkirin.

## Hişmendiya Çînê:



**Konfoşyos**

Ji hêla hişmendiyê ve, Çînê ramana Konfoşyos li pêş xistiye.
Konfoşyos, di navbera salên (551-479 ên B.Z) de, ji dayîk bûye. Biçûkaniya xwe di xizaniyê de, derbas kiriye. Dema ku mezin bû wekî karmendekî li gel hikûmetê kar kiriye. Piştre dev ji kar berdide û 16 salan di nava civakê de, digere û şîretkariyê dike. Her wiha dema ku vedgere, bingehê ramana wî ya sincî, tê meyandin û dibêje: "Divê ku hikûmet di xizmeta civakê de be."
Ramana Konfoşyos di bingehê xwe de, felsefeya sincî ye. Dema Konfoşyos derket, Çîn di nava şerê deshiladariyê de bû, ji bo wê jî xwestiye di çînê de, aramiyê ava bike û ramana xwe li ser vî bingehî, ava kiriye. Ramanên wî, heya îro jî li Çîn, Koreya, Japonya û derdora wan bandordar in.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çîn, li ku derê cih digre?

2. Çima Şaristaniya Çînê, di cîhanê de, bi nav û deng e?

3. Çima êrîş li ser Şaristaniya Çînê, dihatin kirin?

4. Şaristaniya Çînê, kîjan hêl bi pêş xistine?

5. Ramana Konfoşyos li ser çi bingehî ava bûye?

WANE 7

# ŞARISTANIYA HINDISTANÊ




Hindistan, li başûrê parzemîna Asyayê ye; nîvgiraveke pir mezin e û li ber Okyanûsa Hindî ye. Li Hindistanê bilintirîn rêzeçiyayên cîhanê, yê bi navê Hîmalayayê hene. Beravên Çemê Ganc û Hindosê xakên herî berhemdar ên Hindistanê ne, ji ber vê yekê pîroz hatine dîtin. Şaristaniya Hindistanê di 3.000 ê B.Z de, li beravên Hindosê bi pêş ketiye. Du navendên girîng ên şaristaniya Hindistanê hene:


## Mohenjadaro û Harapa:

Şaristaniyên Harapa û Mohanjadaroyê, weke hemû şaristaniyan, li beravên çeman û di xakên berhemdar de bi cih bûne. Terzê avakirina xaniyên ku bi qermîdên şewitî hatine avakirin heta du qatan peyda dibe. Kolanên bajêr bi rengekî rêxistinî û bi şêweyê stûnî û asoyî, hatine avakirin. Coyên avê, di hemû kolanan de, bi awayekî pêşketî li gorî serdema xwe, hatine kolandin. Her wiha keleh û depoyên genim ava kirine. Dawîbûna her du şaristaniyan di 2.000 ê B.Z de, tê texmînkirin.

Berhemên pir balkêş û peykerokên kêmpeyda, li vê derê hatine vedîtin. Mînak: Peykerê Keça Dîlankar a ku ji tuncê hatiye çêkirin û peykerê Qiralxweda yê ku ji kevir hatiye tiraşkirin.



Keça Dîlankar



Qiralxweda

Ji bermahiyên Harapa û Mohenjadaroyê tê nasîn ku ji çanda Neolîtîk a Mezopotamyayê, gelek bandor bûye. Di heman demê de, têkiliyên wan bi sumeran re jî hebûn. Ev têkilî, têkiliyeke bazirganî bû, di rêya Okyanûsa Hindî re, pêk dihat û dibe ku weke mêtingeheke bazirganiyê ya sumeran li Hindistanê bû.

- Di çanda Gancî de, Çemê Gancê pîroz e, ji ber vê yekê, serdana wî çemî û şûştina di ava wî de, weke nirx û erkekî olî ye. Ew bawer dikin ku bi vê şûştinê ew ji hemû kêmasî û gunehên xwe, paqij dibin. Dema ku ew jiyana xwe ji dest didin, termên xwe dişewitînin û xweliya mayî li ser rûyê avê belav dikin.

## Bûda:

Ji hêla hişmendiyê ve, ramana bûdîzimê li Hindistanê li pêş ketiye. Dema li Hindistanê Bûda derketiye, brahmanîzm serwer bû. Di nava brahmanîzmê de, pergala çînîtiyê ya hişk hatibû avakirin.

1. (Brahman): Qata jor a mêrên oldar e.
2. (Ksatriya): Qata jêrî wan e; kesên navdar û leşker in.
3. (Vayîsya): Qata gundî û bazirganan e.
4. (Sûdra): Çîna karkeran e.
5. (Parya): Ji kole û karkerên karê herî giran dikin, ango ji xizmetkarên wan re, tê gotin.

Di navbera van çînan de, têkiliyên gelek hişk û qedexe hene.



Bûda

Bûda (563- 483 B.Z) ji nav brahmayiyan derdikeve û li dijî wan, hişmendiyeke nû li bi pêş dixe. Hişmendiya Bûda, li ser bingehê felsefeya sincî, xwezayî, zanabûn û hizirandinê bi pêş dikeve.

Ramana Bûda, heta îro jî berdewam e û li herêma Hindistan, Çîn, Japonya, Rûsya, Amerîka û hwd, bibandor e.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Kengî û li ku derê Şaristaniya Hindistanê, xwe li pêş xistiye?

2. Şaristaniyên Harapa û Mohanjadaroyê, binirxîne.

3. Awayê perestina bûdîzmê, lêkolîn bike.

4. Çima Hindistaniyan, baweriya xwe bi avê anîne? Şîrove bike.

WANE 8

# ŞARISTANIYÊN AMERÎKAYÊ


## Şaristaniya Ênkayê:

Şaristaniyeke kevin e, li Amerîkaya Latînî li ser destê hind-amerîkayan (gelê resen ê Amerîkayê) li ser qontarê Çiyayê Endîzê, hatiye avakirin. Şaristaniya Ênkayê ji mezintirîn şaristaniyên Amerîkaya Latînî ye û di dema niha de, welatên Bolîvya, Perû, Ekwador, Şîlî û Arjantîn li cihê vê şaristaniyê ne.



Paytexta wan "Kisko" ye, ku navê "Bajarê Roja Pîroz" lê hatiye kirin. Kisko bajarekî balkêş û tijî perestgeh û koşkên mezin e. Ênkayê bi kanzayên wekî zêr û zîv dewlemend e. Debara wan bi piranî bi rêya çandiniya garis, petat, fûl, kundir, bacan û kedîkirina lawirên mîna lama û êlbka re bû. Ênkayê di geometriya avdanê de, pir li pêş bû; qontarên çiyayan ji bo çandiniyê kiribûn pêpilk. Di belavkirina berhemên çandiniyê de, sîstema sêpar pêk dianîn; parek ya malbata serwer e, parek ya mîran e û yek jî ya milet bû. Ji bo parastina ji salên zuhabûnê berhem dihatin depokirin. Her wiha gelek rêyên ku navenda wê

paytexta wan Kisko bû, çêkirin. Pirên ku Ênkayê ava kirine, pir balkêş in, ji ber ku ji hûnandina pel û şaxên daran çêdikirin û li cihên bilind, dihatin daleqandin.



Lama

Weke şaristaniyeke kevinar di asteke bilind de cih digre, ji ber ku li ser rêgezên aboriyî û civakî ava bûbû.

Ji ber dewlemendiya xaka wan (taybetî bi zêr dewlemend bû) dagirkerên Spanyayî bi ser de hatin, hemû berhemên vê şaristaniyê desteser kirin û dawî li vê şaristaniya kevinar anîn.

## Şaristaniya Mayayê:

Yek ji şaristaniyên kevin ên ku bi destê hind-amerîkayan li Amerîkaya Navîn, ava bûye. Nêzî sala 1800 ê B.Z li welatên ku îro bi navê Hondûras, Salvador, Guatemala û Meksîkayê tên nasîn, ava bûye. Ji hêla çandiniyê ve, gelê Mayayê, garis di xakên şilî de çandine, her wiha rê jî dûz kirine.



Pîramîdên Mayayê

Bi avahîsazî û hunera xwe balkêş e. Ev yek di qalibên nivîskî, seramîkên biwêne, mal, perestgeh û pîramîdên mezin ên ku heta niha, weke berhemên vê şaristaniyê ne, xuya dike. Pîramîdên ku bilindahiya wan dighêje 60 m ava kirine. Li ser lûtkeya van pîramîdan perestgehên xwe çêkirine. Di Şaristaniya Mayayê de, saleke pîroz hebû ku li ser 13 menên demî dabeş kiribûn. Her menek 20 roj bûn. Salnameya rojê nas kiribûn ku li ser 365 rojan dabeş kiribûn, lê texmîn dikirin ku saleke rojê, zêdetirî 365 rojan e (365, 2.420). Ev hesab, ne dûrî hesabên astronomiya îro ye (365, 2.422). Her wiha salnameya heyvê jî bikar dianîn.

Tevî êrîşên dagirkerên Spanyayî, ji ber ku çand û kevineşopiyên xwe parastine ev gelê kevinar, tune nebûye. Her wiha zimanê mayayî heta îro bi milyonan pê diaxivin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Hind-amerîkan kî ne? Lêkolîn bike.
2. Şaristaniya Ênkayê li ku derê derketiye?
3. Çi hişt ku çavên dagirkeran li şaristaniya Ênkayê vebe?
4. Salnameya rojê ya ku Mayayê çêkiriye, şîrove bike.
5. Pîramîdên Mayayê nîşaneya çi ne?

# BEŞA 5

- Hûrî
- Îlam û Gûtî
- Lûlû û Kasît
- Mîtanî û Nayîrî
- Urartu û Hîtît

***(Kurd û Kurdistan)***

*Di tabloyên nivîskî yên ji pêvajoya Sumer, Ekad, Babil, Aşûr û Hîtîtan de, navên cur bi cur li kurdan hatiye kirin, hin ji wan ev in: gût, kirt, kurt, kardaka û kardox... Piraniya van navan bi armanca pesindayînê, li kurdan hatiye kirin. Bi van navên ku bi kar tanîn, xwestine hêzbûn, cengawerî û qehremaniya civaka kurdan bînin ziman.*

*Di zimanê sumerî de "kur" tê wateya çiya û paşgira "tî" girêdanê diyar dike. Bi vî awayî, peyva "kurtî" tê wateya gelên çiyayî. Her wiha, civaka lîdî ji bo civaka kurdî, peyva "Gundwan" bi kar anîne. Ev peyv jî tê wateya "welatê gundan". Aşûran jî navê "Naîrî" bi kar anîne, ango "gelê robaran". Di bin erdê de, di navbera Dîcle û Feratê de, gundên herî pêşî yên şoreşa Neolîtîkê dimînin. Ev gund, weke ku tê zanîn, hemû jî yên kurdan in. Di serdema navîn de, di zimanê selçûqiyên Îranê de, peyva Kurdistan cara yekê tê bikaranîn.*


WANE 1

# HÛRÎ

Hûrî, ji êlên aryen in. Di zimanê sumerî de, hûrî ji cihên bilind re, tê gotin, lewma erdnîgariya çiyayî ya Mezopotamyaya Jorîn, bi navê Hûrî hatiye nasîn.

Gelê ku li rojavayê Çiyayên Toros û Zagrosê dijiyan, cara destpêkê bi navê hûrî, di 3.000 ê B.Z de ji aliyê sumeran ve hatine binavkirin. Lê li gorî lêkolînan, di salên 6000 ê B.Z de derketine holê. Navendên hûriyan ên sereke îro bi navên Riha, Mêrdîn, Amed, Kerkûk, Tilberak, Tilfexriyê, Çaxirbazar, Orkêş û hwd, tên nasîn.

Hûrî xwediyê Neolîtîkê ne ku li ser beravên jorîn ên Dîcle û Feratê bi cih bûne. Li gorî hin şîroveyan, ên ku çanda Tilhelefê ava kirine, gelê hûrî ne. Ji ber ku çanda çandiniyê, bandoreke gelekî xurt li herêmê kiriye.



## Ziman û Baweriya Hûriyan:

Li gorî lêkolînên misoger, diyar dibe ku hûrî pêşiyên kurdan in, ji ber ku pir gotinên ku kurd heta îro bi kar tînin, koka xwe ji zimanê hûrî digre.

Bandora hûriyan ya îdyolojîk li sumeran heye. Bi taybet ji hêla ziman ve, gelek gotinên mê yên ku derbasî zimanê sumerî bûne, bi koka xwe ji zimanê hûrî tên, ji ber ku çanda hûrî û sumerî ji hev û du bandor bûne. Gelê hûrî mîtolojiya sumeran veguherandine çandeke xwecihî. Xwedawendên sumeran **An, Enkî û Înana** navên wan veguherandin **Anû, Komarbî, Tîşûp û Hîpat**. Hîtîtan jî ev nav ji hûriyan girtin û grekan jî ev xwedawend ji hîtîtan girtin û bi navên **Ziyos, Apolo û Afrodêt** di felsefeya xwe de, bi kar anîn. Her wiha bi navên **Jopîter û Vînos** li gel romaniyan hatin nasîn.

Ji 1600 ê B.Z û şûn de, li heman erdnîgariyê mîtan weke berdewamiya çanda hûrî derketine.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Hûrî kî ne, kengî û li ku derê jiyane?

2. Baweriyên hûriyan, bandora xwe li kîjan gelan kirine?

WANE 2

# ÎLAM Û GÛTÎ

## 1. ÎLAM

Îlam, li başûrê rojavayê Îranê weke welatekî kevin û şaristaniyeke dîrokî ye. Di dîrokê de, Îlam ji hêla çandî ve bi Mezopotamyayê re têkildar bû.





Sumeran herêma ku li rojhilatê wan dikeve, bi gotina **Nim** a ku wateya cihê bilind rave dike, bi nav dikirin. Ekadan ji vê herêmê re digotin **Îlamto**. Di Tewratê de, **Îlam** tê gotin. Grekan ew bi navê paytexta wan, Sûsê bi nav kirine û ji wan re, **sûsyana** digotin. Lê îlamiyan bi xwe navekî cuda li xwe kirine ew jî **xatimtî** ye. Ji nivîsa îlamiyan a mîxî xuya dike ku bandora sumeran li wan bûye û bingehê nivîsa xwe ji sumeran girtine. Her wiha bajarê sumeran Lagaş, êrîş bi ser îlamiyan de biriye. Ev yek jî di belgeyên qiralê Lagaşê **Iyanatim** ê ku pesnê xwe bi dagirkirina Îlamê dide û xwe bi navê dagirkerê Îlamê bi nav dike, xuya dike. Lê di dawiya serdema şanişînan de, îlamiyan êrîş birin bi ser Lagaşê de û di hin nivîsan de, wekî talankerê Lagaşê tên naskirin. Di dema dagirkeriya Sargonê Ekadî de, Îlam dikeve bin serweriya imperatoriya wî, zimanê ekadan, dibe

zimanê fermî yê Îlamê. Lê qiral **Bûzir Enşoşnak** ê ku Naramsîn wî weke serwerê Îlamê erkdar kiribû, ziman û nivîsa Îlamê li gel zimanê ekadî bi kar dianî. Dema ku Naramsîn dimre, vî qiralî serxwebûna xwe, ji ekadan ragihand.
Bi demê re, dikevin bin deshilatiya gûtiyan û piştre jî dikevin bin desthilatiya şanişîna bajarê Ûrê ya sêyem.
Piştî sedsala (13 yê B.Z) îlam dîsa bi hêz dibin, welatê kasîtan dagir dikin û gelek berhemên dîrokî bi dest dixin. Mînak: kevirê zagonên Hemorabî û peykerê xwedawend Mardox. Di dema herî bibandor a îlamiyan de, Nebûxez Nesir ê Babilî, Sûsê (paytexta Îlamê) bi dest dixe û dawî li deshilatiya îlaman tîne û wan berheman vedigerîne.
Lê derbeya dawî ya ku şaristaniya Îlamê xwariye di sala 640 ê B.Z de ye; bi destê qiralê aşûriyan Aşûrbanîpal ê ku paytexta Îlamê rûxand.

## 2. GÛTÎ

Gûtî, di zimanê sumerî de, tê wateya gelê xwedîga. Navê gûtî, cara yekem di belgeyên qiralê ekadiyan Naramsîn de, hatiye dîtin. gûtî û cûdî; hemwate ne. Di pêvajoya civaka hûrî de, dîrok dabaşa civakeke din a girêdayî wan dike. Ev hêz, bi navê gûtî derketine holê û ev hêzeke pir xurt a Rojhilata Navîn bû. Gûtî, di navbera Çiyayê Zagros û Çemê Zêyê de, dijiyan.




Di 2.700 ê B.Z de, weke birêveberiyeke serbixwe derdikevin pêş û di erdên berhemdar ên Mezopotamyayê de, bi cih dibin. Zimanê wan û hûriyan yek e. Lê gûtiyan di xebatên fermî de, zimanê ekadî û nivîsên wan bi kar anîne. Li gorî belgeyên

dîrokî, 22 qiralên gûtiyan deshiladarî meşandine. Qiral Qarnasî, weke damezirînerê birêveberiya gûtiyan, tê destnîşankirin.

Ji salên 2.500 ê B.Z û bi şûn de, di nava êlên aryen de, hevgirtinek çêkirine û konfedrasyona êlan bi armanca xweparastinê ava kirine; li beramberî êrîşên sumer û ekadan li ber xwe dane. Dema bihêz bûne jî êrîş li ekadan kirine û imperatorya ekadan hilweşandine.

Piştre gûtî, di welatê sumer û ekadan de, deshiladariyeke xurt dimeşînin. Qiralê ekadî yê navdar Naramsîn, der barê gûtiyan dibêje: "Ew di nava çiyayan de, mezin û bihêz bûne û belavî derdorên xwe bûne". Gûtî jî di warê çand û ziman de, berdewamiya hûriyan in. Pêşiyên medan in û her wiha pêşiyên soranên îro ne. Di hunerên destan de, pêşketî bûn; seramîkên ku bi wêneyan xemilandî çêkirine, ji sifir, zêr û zîv gelek amûrên xemilandinê çêkirine. Êlên lûlû, îlam, îmaş û erdêlayan ji konfedrasiyona wan qut dibin û ev qutbûn, dibe sedema lawaziya gûtiyan. Di vê qelsbûnê de, şanişîna Ûrê êrîşî wan dikin û di sala 2.120 ê B.Z de, wan têk dibin. Gûtî û êlên din, dîsa jiyanê di çiyayan de dibînin û berê xwe didin Çiyayên Zagrosê.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Koka navê Îlamê ji ku tê?

2. Kê derbeya dawî li şaristaniya Îlamê xistiye?

3. Navê gûtî, ji ku hatiye?

4. Gûtî, li ku dijiyan?

5. Gûtiyan, kîjan ziman bi kar anîne?

WANE 3

# LÛLÛ Û KASÎT

## 1. LÛLÛ

Di pêvajoya deshiladariya gûtiyan de, hêzeke din a bi wan re xwediyê heman ziman û çandê ye ku ji wan re lûlû dihat gotin jî dijiyan. Lûlûyan di qadeke berfireh ya ji başûrê Gola Ûrmiyeyê dest pê dike û heta Gola Wanê dirêj dibe, dijiyan û bi gûtiyan re, jiyana xwe derbas dikirin. Lûlû, di aliyê vê herêmê de, ya ber bi rojava ve, dirêj dibe cih digirtin û di wê demê de jî gûtiyan, li herêmên bakurê rojhilat jiyana xwe didomandin.
Lûlû, yek ji civakên Zagrosan bûn û li herêma Suleymaniyê niştecih bûn. Navê qiralên lûlûyan ê yekem Anûbanînî ye.
Qiralê ekadan Naramsîn di 2.190 ê B.Z de, êrîşekê dibe ser lûlûyan. Li himberî vê êrîşê lihevkirina lûlû û gûtiyan çêbû. Bi vê lihevkirinê bi şerekî dijwar ekadan têk dibin.
Qiralê lûlûyan Anûbanînî li ser zinarekî bi awayekî nivîsekî serweriya lûlûyan a li herêma Hîlwan û jiyana wan a hevpar a bi gûtiyan re, tîne ziman. Di vê vegotinê de, dibêje: "Me bi saya xwedawend Înana qiralê ekadan Naramsîn têk bir." Ev nîşan dide ku çanda jinê çanda xwedawendiyê heta wê demê li Kurdistanê serdest e.

Lûlû ji bo ku bikaribin xwe li himberî van êrîşan biparêzin, tev li konfederasyona gûtiyan dibin. Piştî hilweşandina konfederasyona gûtiyan lûlûyî li derdora Zagrosan hebûna xwe heta konfederasyona medan diparêzin. Piştre jî lûlû li himber Aşûrê, tev li konfederasyona Medê dibin.

## 2. KASÎT

Di dîrokê de, bi navê kasît, an jî **kassayî** hatine nasîn. Di zimanê sumerî de, kasît tê wateya gelê hejar an jî karker. Civakeke Çiyayê Zagrosê ye. Pêşiyên lorîyên rojhilatê Kurdistanê ne.

Cara destpêkê, li herêma Kirmanşahê hatine dîtin. Dîroka hatina wan a vê herêmê, nezelal e. Lê weke hemû civakên Zagrosê, xwecihiyên herêmê yên resen in. Ekadiyan, ew weke **kaseşî** bi nav kirine. Ji aliyê rêbaz û çandê ve, taybetiyeke wan a xweser hebû. Bandora van rêbaz û çandan a li ser civakên piştî wan jî hatine, diyar dibe. Kasîtan gelek berhem afirandine.

Di dema qiralê dawî Samûrdîtana yê Babilê de, li gorî belgeyên dîrokî, piştî ku Babil ji aliyê hîtîtan ve, tê talankirin, vedigerin welatê xwe yê li rojavayê Feratê. Piştî vê bûyerê, li Babilê sazûmaniyeke din ji aliyê hemwelatiyên Babilê ve, tê damezirandin. Ev sazûmanî, cardin rastî êrîşên kasîtan tê.




Navê qiralê kasîtan ê wê demê **Xandîş** bû. Di dema vî qiralî de, kasîtan welatê sumeran ji destê qiralê wan ê dawî derdixin û bi vî awayî welatê ekad û sumeran bi navê **Kardunyas** digihînin hev. Ji vir û pê de, ev sazûmanî bi vî navî, tê nasîn. Li Babilê, deshiladariya kasîtan nêzî 400 salî berdewam kiriye. Gelê kasît di dîrokê de, hebûna xwe berdewam dike. Dema Iskender (330 yê B.Z) êrîşî Kurdistan û Îranê dike, li herêma Zagrosê bi berxwedaniya kasîtan re rû bi rû dimîne. Dîroknasên helenî, vê rewşê dinivîsin.

## Berhemên Kasîtan:

1. Cara yekem, nexweşxane ava kirine.
2. Cara yekem, bi mebesta ku nakokî di nava cotkaran de, dernekeve, kevir ji bo dabeşkirina xakên çandiniyê bi kar anîne (weke çêkirineke hunerî bi navê Kevirê Kodoro tê nasîn).
3. Hesp, erebeyên cengê û bar derbasî Mezopotamiyaya Jêrîn kirine.
4. Salname li gorî salên serweriya qiral bi kar anîne.
5. Kanzaya qesdîrê vedîtine.
6. Xebatên wêjeyî meşandine û bi taybet ji nû ve, destane û efsaneyên kevin ên rojhilatê nivîsandine.
7. Cihê çavdêriya asîman çêkirine.
8. Bi bîrkarî û geometriyê ve, mijûl bûne.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Lûlû, di kîjan pêvajoyê de, derketine holê, kîjan ziman û çand bi kar anîne?

2. Lûlû, ji ku heta ku derê qadên xwe berfireh kirine û bi kê re jiyane?

3. Civaka kasîtan, li ku bi cih bû û li kîjan herêmê dijiya?

4. Kasîtan, bi kîjan rêbazê welatê babiliyan ji destên wan derxistine?

5. Kasîtan, çend salan deshiladarî li Babilê kirine?

6. Hin berhemên kasîtan, diyar bike.


WANE 4

# MÎTANÎ Û NAYÎRÎ

## 1. MÎTANÎ

Konfederasyona mîtaniyan, di destpêka 1.600 ê B.Z de, ji aliyê beşek hûriyan ve, li bakurê rojavayê Kurdistanê, tê damezirandin.

Di belgeyên hîtîtan de, mîtanî bi navê **xanîgalbat** hatine binavkirin. Konfederasyona mîtaniyan, ji bajarê Kerkemîşê yê li beravên Çemê Feratê dest pê dikir, ji başûr bajarê Heleb û Kerkûkê (Nûzî), ji bakur û rojava hîtît, li başûr aşûr û li rojhilatê wan jî hozên hûrî cih digrin. Paytexta konfederasyona mîtaniyan li deşta Rihayê bajarekî bi navê **Waşûkanî** bû (Serê Kaniyê niha).




Komikên hûriyan ên ku bi awayekî serbixwe jiyana xwe didomandin, li himberî êrîşên civakên biyanî gelek caran dibûn yek û bi awayê konfederasyonê jiyana xwe berdewam dikirin.

Derbarê vê birêveberiya ku bi qasî 250 salî berdewam kiriye, belgeyên nivîskî gelek in. Ev belge, bi zimanê hûriyan hatine nivîsandin. Wekî din di belgeyên nivîskî ên Hîtît, Misir û Aşûrê

de jî navê wan bi piranî cih digre. Di belgeyên dîrokî de, navê 14 qiralên ji yek xanedanê hatine dîtin.
Mîtanî, xwediyê şaristaniyeke bilind û pêşketî bûn. Bandora wan a li hîtît, misirî û aşûriyan, di belgeyên nîvîskî de, derbas dibin. Bi xwedîkirina hespan û çêkirina erebeyên cengê, tîr û kevanan navdar bûn. Qiralîçeya Misirê ya navdar Nefertîtî jî ji mîtaniyan bû. Ev hevjînî (zewac) bi armanca ramyariyê, pêk hatiye. Heman peywendî, bi hîtîtan re jî hatibûn sazkirin. Li ser bermahiyên mîtaniyan, li Riha, Kargamiş, Dîlok, Xarpût, Amed, Bismil, Meletî, Heleb, Mûsil û Kerkûkê erdkolanên ku hatine kirin û di derbarê jiyana wan de, zanîn hatine bidestxistin. Her wiha, li Hatûşaşê ya li Anadolê ye, bi vê armancê erdkolan pêk hatine. Bi saya vê yekê, hem derbarê rewşa Hûrî, hem jî ya Mîtaniyan de, agahiyên girîng bi dest ketine.
Di sedsala 13 yê B.Z de, êrîşên hîtîtan li ser mîtaniyan zêde dibin. Di van êrîşan de, her ku diçe lewazî di parastinê de çêdibe. Di encamê de, di 1.250 yê B.Z de, deshiladariya mîtaniyan li herêmê qels dibe û bêbandor dimîne.

## 2. NAYÎRÎ

Derbarê vê civakê û rista wê ya dîrokî de, em ji belgeyên ku ji aşûriyan mane, agahiyan werdigirin. Li gorî vê, di 1200 ê B.Z de, li derdora Zagrosê hatine dîtin. Aşûriyan, bi wateya welatê **avê** an jî **rûbaran**, peyva **Nayîrî** ji bo wan bi kar anîne. Ew weke berdewamiya hûriyan tên pejirandin.

Piştî birêveberiya mîtanî tê rûxandin, ev civak dibe xwedîya girîngiyeke mezin. Heke deshiladariyeke mezin nebe jî weke konfederasyon, ango hêzeke ji deshiladariyên biçûk pêk hatiye û di dîrokê de, cih girtiye. Ji belgeyên ku ji demên kevin de mane, em tê dighêjin ku welatê Nayîrî, ji çavkaniya Dîcle û Feratê, dest pê dike. Bajarên Amed, Xarpût, Dêrsim, çiya û herêmên Bedlîs heta deverên derdora Zagrosan didome.

Di sala 910 ê B.Z de, leşkerên aşûriyan çûne ser welatê Kutmaxê (di navbera Çemê Dîcle û herêma Cûdî de ye) û bi

wan re şer kirine. Armanca aşûriyan bidesxistina amûrên kanzayî (hesin, sifir) pêşketinên çandinî û talankirina dewlemendiya welatê nayîriyan bû. Sewalên nayîriyan ên ku bidestxistine, talan kirine. Di sala 900 ê B.Z de, bi êrîşeke aşûriyan ve rû bi rû dimînin, di encama vê êrîşê de, nayîrî têk diçin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Mîtanî di kîjan salê de, derketine holê û ji aliyê kê ve, hatine damezirandin?

2. Navê paytexta mîtaniyan çi bû û li ku bi cih bibûn?

3. Mîtanî bi çi awayî dijiyan?

4. Mîtanî, nêzî çend salan li ser birêveberiyê mane û kîjan ziman bi kar tanîn?

5. Bandora şaristaniya mîtaniyan, li kîjan gelî hebû?

6. Li gorî belgeyên dîrokî, nayîrî li ku derê jiyane?

7. Aşûriyan, çi nav li nayîriyan kiribûn?

8. Piştî şkandina nayîriyan, kê cihê wan girt?

WANE 5

# URARTU Û HÎTÎT

## 1. URARTU

Piştî şkandina bandora naîriyan, hêzeke nû ya bi navê Urartu, di 900 ê B.Z de, derdikeve qada dîrokê. Urartu hem weke welatekî çiyayî hem jî bi navê xwedayê xwe Xalidî dihat nasîn. Urartu, berdewama naîriyan e. Zimanê wan zimanê hûrî ye. Dema deshiladariya naîriyan têk diçe, di herêmê de, begitiyên biçûk û serbixwe derdikevin holê. Ev begitiyên biçûk yên di bingeha xwe de, digihên hûriyan, bi civakên cuda yên di demên cur bi cur de, hatin herêmê û bi niştecihbûnê re, tev li hev dibin û bi demê re, civaka bi navê Urartu pêk tînin. Sînorê urartuyîyan, ji Çemê Feratê dest pê dike, heta Ermenistan, Toros û Zagrosê digre nava xwe. Dewleta urartuyiyan, di sala 875 ê B.Z de, ji hêla Sardûr ve tê avakirin. Paytexta wan Tûşpa (Wan) e.




Qiral Sardûr ji bo ku xwe ji êrîşên aşûriyan biparêze, Kelha Wanê ya ku heta îro maye, ava dike. Li ser burceke kelehê ku bi navê wî tê nasîn, bi nivîsa mîxî nivîsek kolaye. Di nivîsê de, qiral Sardûr xwe weke qiralê Urartuyê yê mezin daye nasîn. Bernameya xwe ya ramyarî rave kiriye û diyar kiriye ku

deshiladariya aşûriyan napejirîne. Kevirên vê kelehê tev ji ser avê ji Ercişê anîne. Ev kevirên ku ew qas ji dûr ve hatine anîn, di nav wan de ên ku giraniya wan 30-40 ton in hene. Her wiha gelek bajar ji hêla urartuyiyan ve, hatine avakirin.
Di erdnîgariya Mezopotamyaya Jorîn de, rêyên bazirganiyê di navbera Rojhilat û Rojava de vekirine û heta îro jî hinek ji van rêyan tên bikaranîn. Her wiha rêyên ku dighêjin serê çiyayan jî çêkirine. Urartu bi taybetî di mijara coyên avdanê de, gelekî pêşketî bû, Bi dezgehên xwe yên avdanê re, berhemên xaka xwe zêde kirine. Her wiha di lawirvanî û bikaranîna kanzayan de jî pêşketî bû.
Urartu şaristaniyeke ku li ser bingehê çand û berxwedanê hatiye avakirin. Nêzî sêsed salî li hember êrîşên îskît û aşûriyan, li ber xwe daye. Ji aliyê çandî, pîşesazî, çêkirina amûrên şer, çêkirina zîv û zêr, avahîsazî, çandinî û lawirvaniyê ve, pêşketî bûn.
Gelê ermen û gelê kurd di nava vê şaristaniyê de, gelên herî girîng bûn. Gelê ermen zêdetir bi pîşesazî, bazirganî û çêkirina zîv û zêr ve, mijûl dibûn. Gelê kurd jî zêdetir bi çandinî û lawirvaniyê ve mijûl dibûn.
Urartu di sala 606 ê B.Z de, ji aliyê deshiladariya medan ve tê rûxandin.

## 2. HÎTÎT

Civaka hîtît, şaristaniyeke di Asya biçûk de , weke encama koloniyeke sumeriyan di (1900-1200 B.Z) de, derdikeve qada dîrokê û deshiladariya herêmê, dixe bin destên xwe. Paytexta wê, Hatûşaş e. Weke modela birêvebirinê jî, modela sumeriyan bingeh digire. Bi qasî ku navendeke bazirganiyê bû, ew qasî jî li herêmê xwediyê çavkaniyên kanzayî bû ku ji bo wan dibû deskeftiyeke mezin. Hîtît, beramberiya babilî, aşûrî û misiriyan dikir.
Di sala 1.595 ê B.Z de, Babilê dagir dikin û di 1.243 ê B.Z de, bi misiriyan re peymana Qadişê mor dikin. Cara pêşîn, xwediyê çêkirineke konfederasyona êlan bûn û piştre bi demê re veguherî çêkereke koledar. Di şaristaniya Anatolyayê de, kedeke mezin a hîtîtiyan heye. Di nava xwe de etnîkiyên mîna: xalidî, hûrî û

lûwiyan dihewêne. Ev her sê komên etnîkî, xwediyê çand û zimanê aryenî ne. Hêza xwe ya bingehîn, ji çavkaniyên kanzayan digirt. Nêzîkatiyên wan ên xweparastinê, di serê her tiştî de, parastina çavkaniyên kanzayan bû.
Hîtîtî, ji ber pêwîstiyên kanzayan bi Babil, Misir, Konfederasyona Mîtaniyan, Helen û Îyoniyan re, her tim di rewşa şer de bûn. Komên etnîkî yên ku di koka xwe de ermen in, hesin û sifir bi kar anîne û ji şaristaniyê re bûne alîkarên herî mezin. Hêzeke wan a xwedayî hebû ku ji efsaneyên sumer û komên etnîk ên aryen hatibû û vê baweriyê xwe dispart xwedatiya sêalî ya ezman, erd û axê.

## Taybetiyên girîng ên hîtîtiyan:

1. Ji aliyê birêveberiyê ve piştî qiral, qiralîçe dihat.
2. Xwediyê artêşeke bihêz bûn. Artêşa wan, ji siwar û peyayan pêk dihat. Her wiha, yekîneyên ku qiral diparastin hebûn. Çekên wan: tîr, kevan, rim, şûr û mertal bûn.
3. Ola wan pirxwedayî bû, ji ber vê yekê, ji welatê wan re digotin: Welatê Hezarxwedayî.
4. Du cureyên nivîsê bi kar anîne; nivîsa mîxî û nivîsa hiyeroglîfî.
5. Di bikaranîna heyberan de, pir pêşketî bûn; gelek tişt ji zêr û zîv çêkirine.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Navê urartuyiyan ji ku hatiye?
2. Ûr, bi sumerî tê çi wateyê?
3. Urartu, çawa ava bûye û sînorên xwe çi qas berfireh kiriye?
4. Navê paytexta hîtîtan, çi bû û birêveberiya xwe weke kîjan şaristaniyê, bi rê ve birine?
5. Hîtîtan hêza xwe ji ku digirtin?
6. Hîtîtan xwe dispartin kîjan olê?
7. Çar taybetiyên hîtîtan binivîse.

# BEŞA 6

- Med
- Keyaksar û Astiyag
- Girîngiya medan di Rojhilata Navîn de
- Dema Med-Pers

WANE 1

# MED

Kurd, berî ku dewleta Medan damezrînin, bi awayekî belav weke hoz û êlan dijiyan. Di navbera wan de, yekî tune bû. Di bin zordariya hêzên din ên herêmê de, dijiyan. Imperatoriya




Aşûrî, wê demê gelekî bi hêz bû. Êrîşî kurdan û civakên din ên li herêmê dikirin. Zordariya wan bêsînor bûbû. Ji sala 1300 ê B.Z û bi şûn de, aşûr sîstema xwe ya koledariyê berfireh dikin û dibin hêza herî mezin. Aşûriyan bênavber êrîşên pir mezin li herêmên derdora xwe kirin. Ji ber dewlemendiya welatê medan, êrîş li medan zêdetir dibûn. Di encama êrîşên ku li ser wan hoz û êlan de pêk dihatin, pir mirov dihatin kuştin û dest bi koçberiyê kirin. Di bin van mercan de, hoz û êlên di herêmê de, jiyana xwe di bin zor û zehmetiyan de, derbas dikirin. Ji medan re du rê hatibûn hiştin; an wê koletiyê bipejirînin an jî wê berxwedaneke mezin bidin destpêkirin. Hoz û êlên herêmê berxwedana mezin hilbijartin û dest bi şerê azadiyê kirin. Di konfederasyona ku hatibû avakirin de, deshiladarî tune bû, lê di demên dawî de, weke pergalên hemdem, ber bi deshiladariyê ve diçû. Li gorî dîroknasê Yûnanistanî Heredot, hejmara qiralên medan çar in û navên wan ev in: ***Diyako, Firortîş, Keyaksar û Astiyag*.**

## 1. DIYAKO (KEYKUBAT)

Weke damezrînerê yekem ê dewleta Medê tê naskirin. Di destpêka sedsala 8 ê B.Z de, dibe qiral. Di pêvajoya vî qiralî de, welatê medan weke hêzeke nû derdikeve pêş. Med û êlên din ên pêşiyên kurdan li derdora wî kom dibin. Diyako, birêveberiyeke baş dimeşîne. Ji bo parastina welatê xwe, kelehan dide avakirin û li dijî êrîşên aşûriyan radiweste. Di dema deshiladariya Diyako de, civaka wî di gelek aliyan de, pêşketinên berbiçav bi dest dixe. Ji wan jî yekîtiya civakê saz dike û bajarê Ekbatanê (Hemedan) dike paytexta dewleta xwe.

Diyako, 53 salan bi awayekî serkeftî deshiladariya dewleta Medan dike. Piştî mirina wî, kurê wî yê bi navê Firortîş dibe qiralê Medê ( 655 B.Z).

## 2. FIRORTÎŞ

Qiral Firortîş hinek hozên arî yên ku ji aliyê rojhilat ve hatine herêmê, xistin bin deshiladariya xwe. Civaka pers jî bi heman awayî bi xwe ve, girê da. Bi van pêşketinan re, dewleta Medê bi hêz û mezintir bû. Firortîş, ji rewşa erênî ya heyî sûd wergirt û ragihand ku tu caran wê bandor û gefên aşûriyan ên li ser welatê xwe nepejirîne. Li aliyê din, pêşveçûnên ku di welatê Medan de çêbûne, bala aşûriyan jî dikişand ser xwe. Rewşa derketî holê ji bo aşûriyan metirsî diafirand. Aşûrî ji bo ku vê metirsiyê rakin dest bi êrîşan li ser welatê medan kirin. Di vê cengê de, Firortîş û piraniya serokêlên pê re şer dikirin, ji aliyê aşûriyan ve, hatin kuştin ( 633 B.Z).

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Medan, kîjan bajar ji xwe re, kiribûn paytext?

2. Medan, ji bo çi û di kîjan salê de, yekîtiya hozan çêkirine?

3. Yekemîn birêveberê konfederasyona medan kî ye û di kîjan salê de ye?

4. Diyako, giringî da çi û ji bo çi keleh ava kirin?

WANE 2

# KEYAKSAR Û ASTIYAG

## 3. KEYAKSAR

Piştî qiral Firortîş ji aliyê aşûriyan ve tê kuştin, birayê wî yê biçûk ê bi navê Keyaksar dikeve şûna wî. Weke xebata yekem, artêşa medan ji nû ve, birêxistin dike. Artêşa xwe weke siwar û peya ava kir.

Piştî temamkirina leşkerî û sazûmankirina artêşê, li hember aşûriyan dest bi xebatên hevkariyê dike. Bi qiralê Babilê yê wê demê Nabopolasar re, peymaneke hevkariyê dike. Bi heman awayî bi îskîtiyan re jî peymanekê mor dike.

Di 1 ê çileya 615 yê B.Z de, bi artêşeke mezin dikeve rê. Bi artêşa xwe re, ket nava welatê aşûriyan. Di demeke kin de, bajarê Erebxa (Kerkuk) xist bin kontrola xwe û ji bo tevgera xwe ev bajar kir navend.

Piştî bajarê Kerkukê bi dest xist, ew kir navenda amadekariyên êrîşên ser aşûriyan. Artêşa medan di bin birêveberiya Keyaksar de, di sala 614 yê B.Z de, berê xwe da paytexta dewleta aşûriyan, Nîneweyê. Bajarê Arbeziyê yê ku di rêya wan de bû kontrol kir. Piştre, bi leşkerên Babilê re peywendiyê saz dike, berê xwe da aliyê başûr û bajarê Aşûrê yê ku navendeke pir kevin a dewleta Aşûrê bû bi dest xist û talan û wêran kir.

Piştî ku ev bajarê girîng hate kontrolkirin, qiralê Babilê di derbarê yekîtiya li hember aşûriyan de û parvekirina sînorên aşûriyan ên piştî şer, bi Keyaksar re levhatinek pêk anî. Keyaksar jî ji bo xûrtkirina vê peywendiya ramyarî, neviya xwe (keça Astiyag ku navê wê **Emîtîs** bû) da Nebûxez Nesir; kurê qiralê Babilê. Di heman demê de pêwendiyên yêkitiyê, bi birêveberên îskîtiyan re jî pêk anîn.

Du sal piştî dagirkirina bajarê Aşûrê (Şirgat) ango di 612 yê B.Z de, hêzên med, babil û îskîtan, di eniyeke berfireh de ji sê milan ve, êrîşeke mezin birin ser paytexta dewleta Aşûrê (Nînewa). Li gorî lêkolînan, bajarê Nîneweyê piştî dorpêçeke sê mehan û şerekî pir dijwar, di 21'ê Adara 612 yê B.Z de hatiye

bidestxistin. Ew roj ji bo gelê med û gelên derdora wan, dibe roja serkeftin û azadiyê, ji ber ku hêza aşûriyan a ku pergala koledariyê di asta jor de dabû rûniştandin û azadiya gelan desteser kiribû, ji holê hat rakirin. Ev roj ji bo med û gelên herêmê bû roja CEJNA NEWROZÊ. Qiralê Aşûrê yê wê demê Sîn-Şar-Îşkum, dema tê dighêje ku bajar ji destê wî derdikeve, bi mal û malbata xwe re xwe davêjin nav agir û xwe dişewitînin. Beşek ji aşûriyan ên ku ji kuştinê filitîn jî, bi birêveberê xwe yên bi navê Aşûr Obalît re diçin Heranê û li wir ji nû ve, dewletekê dadimezrînin.
Piştî vê serkeftina dîrokî, qiral Keyaksar û artêşa medan vegeriyan welatê xwe. Lê sala piştî wê (611 B.Z) li ser daxwaza Nabopolasarê Qiralê Babilî, berê artêşa xwe da bajarê Heranê, paytexta aşûriyan a nû, ev bajar jî bi dest xistin û careke din bi paş de vegeriyan.

## 4. ASTIYAG

Piştî mirina Keyaksar kurê wî yê bi navê Astiyag bû qiralê dewleta Medê.
Bi deshiladariya Astiyag re, pêşveçûnên ku di demên nêzîk de pêk hatine, rawestiyan. Ji ber ku Astiyag mirovekî aştîxwaz bû; di pêvajoya deshiladariya wî de, aştî û azadî di asteke bilind de bûn. Di welatê medan de pêşketina aştî û azadiyê, bi xwe re di aliyê leşkerî de, lawazbûn û jihêzketina dewletê anî. Di encamê de, bandora Astiyag a di nava civaka wî de, kêm bûbû û bi wî re, dewleta medan jî ket pêvajoya lawazbûnê û hêdî hêdî bandora xwe winda dikir.
Vê rewşê di birêveberiyê de lawazbûn derxiste holê, derfetên xwebirêxistinkirina şahnişînekê ya persan ku heta wê demê tu bandora wan di nava dewletê de nebû, dabûn afirandin. Kîros, serokê persan û neviyê Qiral Astiyag bû û bi awayekî neyînî di nava dewletê de, roj bi roj xwe birêxistin dikir. Hinek ji rêberên civaka arî û xûyayiyên medan jî di nava vê tevgera de, li dijî Astiyag cihên xwe girtibûn. Berpirsê leşkerî yê medan ê bi navê Harbakos jî bi Kîros re alîkarî dikir. Di dawiyê de, Kîros li dijî Qiral Astiyag şer da destpêkirin. Hêzên Astiyag û yên Kîros

hatin himberî hev û di navbera wan de cengeke giran pêk hat. Di dawiya cengê de, artêşa Astiyag têk çû û ew bi xwe jî dîl ket destê persan.
Bi vê bûyerê re dewleta medan ku di pêvajoya pêşketinê de bû, ji holê hat rakirin û di şûna wê de, pêvajoya deshiladariya Kîros ku ji xanedana axameniyan bû dest pê kir (550 B.Z).
Piştî ku Astiyag têk diçe ji bo Harbakos wiha dibêje:
**"Hey rezîl, te xiyanet li min kir, keyetiya min helweşand, qet nebe tu bi xwe li textê min rûniştana, hey te ev jî nekir qet nebe te keyatî bi destê medan ve berdana, çima te keyatî bi rezîlî bir û radestî xulamê me Kîros kir"**

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Keyakser, hêzeke çawa ava kir?
2. Keyakser, hevpeyman bi kê re çêkir?
3. Di dema kê de, xinizî li medan hat kirin û kê xinizî li wan kir?

WANE 3

# GIRÎNGIYA MEDAN DI ROJHILATA NAVÎN DE

Serdema medan, di dîroka kurdan de serdema herî girîng e. Di nava civaka kurdan de, pêşveçûnên girîng ên civakî û ramyarî di vê serdemê de pêk hatine. Em dikarin van pêşketinan, bi vî awayî rêz bikin:

Di dema medan de, cara destpêkê ye ku tevahî Kurdistan û civakên aryen, yekîtiyeke ramyarî çêdikin. Kurd, di vê serdemê de, weke hoz û êlan dijîn. Ev êl û hoz, car caran yekîteyeke xwe çêdikirin û bi vî awayî pêkhateya xwe ya ramyarî diafirandin.

Ev hevgirtin, tevahî êlên herêmê nagire nava xwe, lê di dema medan de ev yekîtî hemû êl û hozên kurd, girtiye nava xwe. Vê yekîtiya giştî, bingeha pêvajoya netewbûna kurdan pêk aniye. Zimanê kurdî jî bi vê yekîtiyê re derbasî pêvajoya zimanê netewî dibe.

Di Rojhilata Navîn de, dibe destpêkirina pêvajoyeke dîrokî ku pergala koledariyê ber bi şkestin û nermbûnê ve biçe. Rojhilata Navîn ku di bin deshiladariya koledar a aşûriyan de bû, ber bi tunebûnê ve diçû, di bin pêşengiya medan de ev pergal şkestiye. Bi şkestina vê pergalê re, şaristaniya navendî nerm bûye û ber bi guherînê ve çûye.

Di derbaskirina şaristaniya Rojhilata Navîn de, a ber bi Asya û Ewrûpayê ve risteke girîng lîstiye. Artêş, cara destpêkê hatiye dabeşkirin û li gorî komên dehkes hatiye birêxistinkirin. Di birêveberiya dewletê de jihevcudabûna hêzan, mijara gotinê ye. Cara destpêkê ye ku zagon, ji pêkhateya birêveberiyan cuda, hatiye sazkirin.

Di beşên huner, perwerde û zanistê de, dibistan hatine vekirin. Di birêveberiya dewletê de, pêkhateyên weke wezaretên îro hatine çêkirin. Postevanî, cara destpêkê di vê demê de pêk hatiye. Budçeya destpêkê, bazara azad û hevkar di dema medan de, hatiye çêkirin. Ji koletiya malê bigire, tevahî koletî hatine qedexekirin.


Di kanzakariyê de, pêşketinên mezin di vê pêvajoyê de pêk hatine. Di vê pêvajoyê de, cara destpêkê ye ku pola, hatiye çêkirin. Pola bi piranî di karên avahîsazî, çek û kanzayan de, dihat bikaranîn. Di avahîsaziyê de pêşketinên mezin çêbûne.
Weke bîrdozî, Zeredeştî hat pejirandin û xebatên fêrkirina Zeredeştiyê, li hemû aliyan belav bû. Hin dîroknas vê derketina medan, weke jidayîkbûna mirovahiyê ya duyem dipejirînin. Bi taybet, şêweyên bîrdozî û rêxistinî yên medan, heta îro jî bandora wan heye.

## Berxwedana Zeredeşt li dijî şaristaniyê û şerê sincî:

Tevî ku nasnameya etnîkî a Zeredeşt ne pirsgirêkeke girîng e jî, hemû jêder koka wî ya medî diyar dikin. Di kurdî de, peyva mag tê wateya pîzot û pêt agir ên di kuçikê de, ketine ser hev. Em dizanin ku di zivistanên sar ên Zagrosê de, hozên medan piraniya jiyana xwe li dora van magan derbas dikirin. Civat û şevbuhêrkên herî gerim li dora van magan digeriyan. Ji ber vê sedemê ji kesên ku civat li derdora agir digerandin re, magî dihat gotin. Di zeredeştiyê de pîrozbûna agir tê zanîn. Ji ber ku di jiyana xwe ya rojane de dizanîbûn ku bêyî agir jiyan ne gengaz e. Li gorî agahiyên misoger Zeredeşt, li welatê Medyayê (bakur-rojavayê Îrana îro) jiyaye. Di nava îdeolojiyên dijberî sîstema şaristaniyê de, cih û wateyeke taybet a zeredeştiyê heye. Zeredeşt li dijî deshiladariya aşûriyan û di bin re, sîstema şaristaniyê bi berxwedana civaka sincî, xwest bersivê bide. Li dijî derewê rastî bû. Derketina tevgera Zeredeştî dispêrin salên 1000 ê B.Z li dijî êrîşên aşûriyan dibe ku ji pêwîstiya bi reformê derketibe holê. Li dijî deshiladariya aşûriyan gavavêtineke îdeolojîk pêwîst bû. Pêşketina wî bi karekterê sincî, bi rastiyê re pêwendîdar e. Hûnandina zeredeştiyê ya îdeolojîk cuda ye; xwe dispêre dualîzimê mîna: ronahî-tarîtî, qencî-xerabî û rastî-şaştî. Bi awayekî diyalektîk nêzî dîrokê jî dibe. Derbarê jiyana civakî de, rêgez û pîvanên wî yên zelal hene.

## Ji rêgezên wî:

1. Girîngiyê dide têkiliyeke tekûz a jin û mêran. Di navbera hevjînan de, ji hiyerarşiyeke bikok zêdetir, têkiliyeke nêzî wekhevî û azadiyê heye.
2. Derew bêsinciya herî mezin e.
3. Jiyana civakî ya ji têkiliyên koletiyê dûr, girîng e.
4. Cotkarî û lawirvanî xebatên aboriyî yên herî girîng in.
5. Li hemberî zindiyan bi temamî helwesteke hawîrdorparêz heye. Ji xwarina goşt xwe dûr digirin.
6. Karûbarên cotkariyê bi perestinê re wekhev têne dîtin.



Bi vî awayî li ser hîmê sincî divê mirov di jiyana civakî de, bi kesayet be û li dijî şaristaniya navendperest be. Ji xwe ev nirxên pîvanî yên şaristaniya demokratîk in ku dest ji wan nabe. Rêûresmên zeredeştiyê yek ji reh û damarên sereke ye ku di çanda Rojhilata Navîn de, divê şaristaniya demokratîk xwedî lê derkeve û xwe pê xwedî bike.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Di kîjan demê de, yekîtiya ramyarî ya di navbera hoz û êlên kurdan de ava bûye?

2. Di dema medan de, pergala koledariyê çawa bû?

3. Di şaristaniya Rojhilata Navîn de, ya ber bi Asya û Ewrûpayê ve ,cara yekem artêş çawa tê birêxistinkirin?

4. Rêxistina medan bi çi awayî bû?

5. Mirov ji çi têdighêje ku Zeredeşt bi koka xwe kurd e?


6. Berxwedana Zeredeşt li hember çi bû?

7. Rêûresmên Zeredeştiyê xwe dispêrin kîjan pîvanan?

WANE 4

# DEMA MED-PERS

Di sala 550 yê B.Z de, bi bidawîbûna konfederasyona medan re, rê li ber birêveberiya persan tê vekirin. Bi deshiladariya Kîros, deshiladarî derbasî şahnişîna axemenîşan dibe. Ev yek ji bo dîroka med û kurdan, dibe demeke nû. Ev dem, di bin destê imperatoriya persan de, bi lihevkirineke demdirêj tê jiyîn. Pers,




li başûr-rojavayê Îranê bi cihwar bûne. Xwediyên çand û zimanê aryen in. Ji persan re parsayî û parsuwayî jî hatiye gotin. Weke xanedan heta ku deshiladarî ji dest medan negirtin, bandoreke pir mezin di dîrokê de çênekirin. Lê belê piştî ku dewleta xwe ava kirin, weke imperatoriyekê di dîrokê de cih girtin. Bandora wan a li dîrokê, pir zêde çêbûye. Weke imperatoriyeke herî bibandor, pergal ava kiriye û heta îro jî wê bandora xwe didomîne. Med û pers, xwediyê heman koka ziman in. Bi rêya zewac û xwînê jî nêzîkbûn û girêdanek di navbera her du gelan de çêbûye.

Her çi qas konfederasyona medan têk çûbe jî û birêveberî ketibe destên persan, med di nava impratoriya persan de jî her tim bûne xwediyê risteke mezin.

Di nava imperatoriyê de her dem, weke gelê duyem cihê xwe girtine û di wê astê de jî bandora xwe kirine. Ji aliyê çandî û leşkerî ve jî medan ew nêzîkatî kiriye. Têgihaştina ku imperatoriya persan, weke berdewamiya medan e, bi vê ve girêdayî ye.

Imperatoriya Persê a ku bi tekîliyên medan ve hatiye meşandin, bi qasî 300 salî jiyaye. Ji Misirê heta Hindistanê û nîvgirava Yûnanistanê berfireh bûye. Di dema xwe de, imperatoriya herî bibandor e û li erdnîgariyeke berfireh deshiladariya xwe ava kiriye. Bi rêya zorê be jî yekîtiya ramyarî ya herî berfireh pêk aniye. Di belavbûyîna çand û zimanê aryen de jî risteke girîng lîstiye.

## Şerên Pers-Yûnan û encamên wan:

Imperatoriya Persê, bi armanca ku sînorên xwe berfireh bike û serweriya xwe belav bike, her dem sînorên xwe yên derveyî berfireh kirine. Sînorên artêşên persan, li rojhilat xwe dispêre Hindistanê, li rojava jî digihêje deriyê Trakyayê û beravên Egeyê yên di sînorê Yûnanistanê de ye bi dest dixin. Rêya ku digihêje heta Persepolisê ya ku weke "Rêya Qiral" tê nasîn, diyar dike çi qas ku persan di erdnîgariyeke berfireh de, deshiladariya ku xwe meşandine. Deshiladariya ku li ser qadeke berfireh e, di navbera gelan de dibe sedema nakokiyan û dibe sedema pêşketina serhildanan

Gelên di beravên Egeyê de dijiyan, bi alîkariya dewletokên Yûnanistanê serhildan bi pêş xistin. Di hin serhildanan de serkeftinê bi dest dixin. Daryos, van serhildanan bi yûnaniyan ve girê dide. Vê yekê dike bihane û bi navê sezakirina Yûnanistanê û bi dawîlêanîna van serhildanan, dest bi êrîşan dike.

Ev êrîş, di sala 490 ê B.Z de pêk tê. Hêzên deryayî yên persan, hin giravên Yûnanistanê yên di Deryaya Egeyê de, bi dest dixin. Artêşa xwe, di Deşta Maratonê re derdixe bejahiyê. Li vê derê

artêşa yûnanê û ya persan tên pêşberî hev. Di vê deştê de di şerên ku navê xwe ji vê deştê girtiye, pers windahiyên mezin didin û têk diçin û ji qada şer vedikşin. Dariyûs ji bo ku tola vê şkestinê bistîne, dest bi amadekariyên şerekî nû dike. Di vê navberê de, li Misirê serhildan çêdibin.

Ji ber vê sedemê, şerê ku amadekariya wê hatibû kirin, tê bipaşxistin. Li vê derê Daryos dimre, Artakserkesê kurê wî tê şûna wî. Ew jî bi armanca temamkirina şerê ku bavê wî amade kiribû, dest bi êrîşê dike. Bi vî awayî di sala 480 ê B.Z de, şerê duyem ê mezin, çêdibe. Artêşa persan, artêşa herî mezin a wê demê bû. Hema bêje, di hemû şerên ku kiriye de bi ser ketibû, weke artêşa ku naşke dabû xuyakirin. Sînorên artêşa persan, ji Hindistanê heta beravên Egeyê berfireh bûbû. Hejmareke zêde ji netewan ketibûn bin deshiladariya imperatoriyê û zordariyên mezin li wan dihatin kirin.

Şkestina wan a li deşta Maratonê, ji bo imperatoriya persan encamên pir giran bi xwe re anîbûn. Şkestina imperatoriya ku heta wê demê, bi çavên ku naşke lê dihat mêzekirin, ev bû sedema serhildana gelên ku di bin deshiladariya wê de bûn. Ev jî ji bo imperatoriyê, dibe destpêka dawîlêhatinê. Imperatoriya Persê, ji vê dîrokê û şûn de bi berdewamî bi paş ketiye û sînorên wê teng bûne. Derbeya dawî ji aliyê Îskenderê Mezin ve, di sala 331 ê B.Z de li nêzî Hewlêrê, di Şerê Gawgemala de xwariye. Qiral Daryos dimire û beşeke mezin a artêşa wî tune dibe û ya din jî belav dibe.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Têkiliya di navbera pers û medan de, Şîrove bike.

2. Çi sedem bû ku gel li hemberî persan dest bi serhildanan kirin?

3. Bi çi bihaneyê Daryos êrîşî Yûnanistanê dike?

4. Li ku derê pers û Yûnanistanî li pêşberî hev tên?

Belavkirina Waneyan Li Ser Sala Xwendinê

| Heftî / Heyv | Hefteya Yekem | Hefteya Duyem | Hefteya Sêyem | Hefteya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | Dîrok | Zanistên girêdayî dîrokê + rêbazên lêkolîna dîrokê |
| Cotmeh | Gerdûn | Jiyana Destpêkê | Civaka Xwezayî | Serdemên Kevirî |
| Mijdar | Mezolîtîk û Neolîtîk | Berhemên Şoreşa Neolîtîkê | Hoz û Êl | Aryen |
| Berfanbar | Semîtîk | Şaristanî | Sumer | Babil |
| Rêbendan | Aşûr | Lêveger | Bêhinvedan | Bêhinvedan |
| Reşemeh | Misir | Çîn | Hindistan | Emerîka |
| Avdar | Hûrî | Îlam û Gûtî | Lûlû û Kasît | Mîtanî û Nayîrî |
| Cotan | Urartu û Hîtît | Med | Keyaksar û Astiyag | Girîngiya Medan |
| Gulan | Dema Med-Pers | Lêveger | | |